


Li Rojhilata Navîn, pêkhatina rûdanên balkêş û girîng didome. Piştî rûdanên dawîn mirov dikare bibêje, herêma navenda polîtîkaya cîhanê. Bi taybetî DYA giraniya xwe dide ser Rojhilata Navîn. Ji ber vê yekê DYA diplomatên xwe yên herî jêhatî û şareza dişîne herêmê.

Cemil Gündoğan, der barê encamên dagirkirina Başûr de bal kişand ser berebaziya PKK û PDK'ê ya ji bo nimîneriya gelê kurd di qada navneteweyî de û diyar kir ku PDK di vî warî de bi ser neketiye. Wî da zanîn ku piştî berxwedana gerîlayan a li dijî PDK û Artêşa Tirk, gelê herêmê bi sempatî nêzîkî PKK'ê dibe.

Rûpel 3



**PKK û ROJHILATA NAVÎN
DÛ HÊZOKO SOROKO**

- Hevpeyvîna Mazhar Günbat, bi Rojnameger û Nivîskarê Kurd Mehmet Aktaş re: "Nivîsandin ji xwe hesap pirsîn e" Rûpel 8-9
- Songul - Roşan Lezgîn bi sernavê "Li nav malbatê girîngiya perwerdehiya zarokan" dest avêtin mijareke ku di civaka kurd de zêde li ser nayê rawestîn Rûpel 4-5
- Mamoste Amed Tîgrîs: "Zanabûna kurdan li ser Beşikçi kêm û kevn e" Rûpel 7

NAVEROK



Zülküf Kışanak: Şehîdê Ruha embaz Halil Özalp

6



Servet Yükselir: Çiroka Binefşa Narîn û Cembeliyê Mîrê Hekarî -II-

10



İslah Ebdulfettah: Siwarê Ronahiya Mûmê

12

Ji Xwendevanan

EM di demê pir tevlihev re derbas dibin. Di vê pêvajoyê de gelê me, dost û dijminên xwe hê baştir nas dike. Dostên gelê kurd li ku bin jî dengê xwe bilind dikin û dostaniya xwe diyar dikin. Dostên dijminê me û xweşroşê gelê me jî bi tewr û tevgerên xwe nasnameya xwe yî rastîn didin naskirin.

Di dema şerê Cezayîr de çawa ku nivîskarê fransîz Sartre, li dijî dewleta xweyî mêtînger li nik gelê Cezayîrê cih girt û şer kir, îro li Tirkiyeyê jî di serî de Mamoste İsmail Beşikçi, gelek rewşenbîrên hêja di nav tevgerêke birûmet de ne. Ew kes li hemberî şerê kirêt derdikevin û mafên bûna gelê kurd diparêzin. Di vê têkoşîna xwe de Beşikçi rûmeta zanistiyê wek gelek 'rewşenbîran' bin pê nekiriye, rastî û zanebûna xwe bi berdêlek pir mezin be jî parastîye.

Wekî Mamoste, divê rewşenbîr, berpirsiya xwe yî dîrokî îro bînin cih. Dost jî, dijmin jî di roja teng de tîn naskirin. Roja ronakbîriyê jî, rewşenbîriyê jî, mirovahiyê jî, îro ye. Sibê dereng e.

M. BEDRAN BÊNAV



Aştî û nankorî

SAMÎ TAN

Generalên tirk ev demê e ku dibêjin: "tiştê ku em bikin, nemaye." Li gorî wan tiştê ku bi çekan were kirin, hatiye kirin û ev gotin cara pêşîn jî hêla Cîgirê Serkanê Giştî yê Artêşa Tirk Çevik Bir ve li Amerîkayê hate gotin. Lê xwediyê van gotinan jî di nav de, ji rayedarên dewleta tirk tu kesî jî bo çareserîya siyasî gavek neavêt. Berevajî wan gotinan kar hate kirin, parêzkarên rejîmê ku li çî cih derfet dîtin, diyar kirin ku wan hê hebûna kurdan nepejirandîye, hê dev ji teoriyên kart-kurt berdana. Belgeyên veşarî yên ku eşkere bûn vê yekê nîşan didin. Lewre li gorî belgeyan dewlet kêmkirina gelheya kurdan û berbandkirina kursên bi zimanê kurdî dixwaze. Li ser vê daxwazê, odayên KÛRT-KAV'ê yên ku tê de dersên zimanê kurdî dihat dayîn, hatin morkirin. Çi partiya ku di bernamêya wê de qala kurdan tê kirin, doza girtinê lê tê vekirin. Bo nimûne li DKP'ya ku serokê wê Şerafettin Elçi li ba rejîmparêzan mirovekî gelekî maqûl e jî, doza girtinê hate vekirin. Her wiha hêzên dewletê jî bo qirkirina kurdan çî ji wan tîn, dikin.

Digel vê helwestê jî aliyê kurd tim doza aştiyê kir. Lê ew daxwaza tevgera kurd wekî nîşana qelsiya wê hate şirovekirin. Heta hinek rêxistinên çepgir jî plan û tevdiirên xwe li ser vê baweriyê kirin. Her wiha Ar-

têşa Tirk li ser vê baweriyê xwest ku derbe-ya herî mezin li Başûr li tevgera kurd bixe. Heta hinek rêxistinên kurd jî bawerîya xwe bi şîrove û nixandinên rayedarên tirk anîn. Lewma ew vexwendin başûrê Kurdistanê, da ku ew "koka PKK'ê biqelînin."

Lê felek ji xwediyên vê bîr û baweriyê re xayîn derket, leşkerên tirk ku piştî çend rojan, rojnamevanên xwe birin Zapê, piştî du-şê rojan, plangerên operasyonê li vê herêmê dan der. Gerîla bi moşekan firokeyên wan xistin, kirin ku ew êdî nikaribin li herêmê firokeyan bi kar bînin. Yekemîn car generalên tirk dan zanîn ku firokeyên wan bi moşekên gerîla hatine xistin. Piştê jî hêzên xwe jî herêmê vekişandin, lê hê jî napejirînin ku hêzên wan li hemberî gerîla xwe ranegirtine, ji bêgavî dev ji herêmê berdane.

Piştî dagirkirina Başûr, li Bakur jî çalakiyên gerîla zêde bûn, tiştê balkêş ev e ku êdî rojnameyên tirk jî nikarin rastiyê veşêrin. Nûçeyên leşkerên ku hatine kuştin wekî kurtenûçe be jî, her roj di çepamenîya tirk de cih digirin.

Niha piştî vê rewşê, dibe ku rayedarên tirk tê bigihîjin ku bi vî awayî nikarin kêşeya kurd çareser bikin. Tê hêvîkirin ku mirovên tirk hinekî li ser rewşê bifikirin, ji dewleta xwe doza aştiyê bikin. Lê hê jî em ji vê rewşê dûr in. Digel vê yekê jî tê dîtin ku wê

çareserîya siyasî were rojevê û nîqaş li ser werin kirin.

Di vî warî de gava ku ji aliyê delegasyona Federasyona Helsinkiyê ya Mafên Mirovan ve hatiye avêtin, gelekî balkêş e. Li gorî nûçeyan, vê delegasyonê çûye kêşeya kurd bi Çevik Bir re nîqaş kiriye. Çevik Bir di vê hevdiinê de jî gotinên xwe yên berê dubare kirine.

Endamê vê heyetê Erik Siesby roja 24'ê mehê di rojnameya Turkish Daily Newsê de gotarek nivîsand. Siesby di vê gotarê de jî bo çareserîya kêşeya kurd hin pêşniyazan dike. Li vir tiştê balkêş ev e ku Siesby dixwaze ku hinek kesên navdar ên ewrûpî li ser navê kurdan bi dewletê re guftûgoyê bikin. Her çiqas çarçoweya ku Siesby diyar dike, dûrî çareseriyê be jî, hêjayî nixradinê ye.

Erik Siesby ji PKK'ê daxuyandina agirbesteke yek-alî dixwaze, lê ji bo vê yekê jî hêzên tirk dixwaze ku ew dernekevin "nêçîra gerîla." Di vê çarçoweyê de dibe ku agirbesteke yek-alî dîsa were rojevê. Heke ev hewldan deriyê aştiyê vekin, tiştê baş e.

Lê di vê nîqaşê de helwesta hinek siyasîvanên kurd, bi rastî mirovan diêşîne. Li gorî van kesan tevgera kurd bi çekan tiştê bi dest nexistiye, wê bi dest nexê jî. Yanê bi hezaran ciwanên kurd ku di şer de hatine kuştin, ji kîsê diya xwe çûne. Dîtinêke bi vî rengî jî bo kurdan nankorî ye. Lewre heke niha qala kurdan, mafê wan tê kirin, ew bi saya serê bi hezaran pakrewanan çêbûye. Rast e, kes naxwaze ku mirov bîn kuştin, lê berxwedana li hemberî zilm û zordariyê li gorî hemû ayîn û bîrdozan tiştê rewşa ye.

Nameyeke vekirî

BAGOK

Birêz kak Mesûd, bi rastî etîkê dîke ku ez van gotinan bi kar bînim, ji ber ku te çî wate, te jî gotina kak û ne ji ya birêz re hiştiye.

Tu çî dikî? Çî bi serê te de hatiye? Ev çî pelandina koran e? Ma Xwedê jî te standiye?

Na na, bila çavên te neçin paş guhên te û ew qas heyirî jî nemîne, ku yekî wekî min jî van gotinên ne xweş dide rûyê te. Ma çî perdeyên şermê man, te neçirandin? Yekî wekî min ku bi rehmetiyê bavê te û tevgera wî ve, ta dawiyê hatibû girêdan, êdî ew jî nema dikare çavên xwe jî vê tevliheviyê re bigire.

Ez jî yek ji van kesên kurd im, ku nû çavên xwe vekirin, gava ku wênayê rehmetiyê bavê te bi diwarê mala wî ve daleqandî bû.

Em tev; dê, bav, xwişk û bira, sibê êvaran, bi rêzgirtineke bê minak li pêşberî wî radiwestiyân û destên xwe bi hêvî û diayan bilind dikirin û ji dilekî paqij digot: Xwedê bi te re be, Xwedê te bi ser xwe, ku tu vî gelê belengaz, ji vê zilm û koletiyê rizgar bikî.

Hê jî mirov bi rêzgirtin wî bi bir tîne, lê êdî tu wî jî, di gorê de, bê kul û xem nahêlî. Erê, sed rehme li wî bavê te. Camêr tiştê ku jê hat, wî kir. Bingeha wî

Piştî Îran û Iraqê niha jî, tu tirkên faşîst ên ku bapîrê te jî bi darve kiribûn, tîni û berdidî ser dilê kesê bi şan û şeref. Ma êdî kesek, ku çendî rûmeta we digirt, dikare hê jî van kiryarên te bipejirîne û daqurtîne?

û ya sedsala bîstan, ne mimkûn bû hev û du bigirin. Li pêşberî bêjiyên wekî Kissenger, bêçare bû. Gelê kurd, ê bi wefa, karesata 1975'an jî, jê qebûl kir û ta roja em tê de jî cihêkî mezin di dilê xwe de jê re veqetandiye. Lê tu bi wan karên xwe yên kirêt û ne mirovane, vî cihî, roj bi roj lê teng dikî.

Ma ne bes e? Te çî heq li wî xweşmîrovî û li vî gelê reben heyê? Ma kengî dê dilê te bi vî gelî bişewite?

Geh Îran û Xumeyniyê wê, geh Seddamê xwîmmîj û hovên wî û dawî jî tirkên faşîst ên ku bapîrê te jî bi darve kiribûn, tu tîni û berdidî ser dilê kesê bi şan û şeref û tiştê kesnedîtî tîni serê wan. Ma êdî kesek, ku çendî rûmeta we digirt, dikare hê jî van kiryarên te bipejirîne û daqurtîne?

Xweş tê bîra min, rojekê ji sala 1964'an bû, ku apekî min, nameyeke rehmetiyê bavê te, da dest min, ku ji rehmetiyê Dr. Ehmed Nafîz re, bibim.

Sed car bi heybetir ji Musfehê, min ew name danî ser destê xwe û berê xwe da Qamişlo. Min xwe, di wan her du saetan de, yek ji bextewertirîn mirov li ser rûyê Cîhanê didît.

Me tevan, li her çar perçe yên welêt, da pey rehmetiyê bavê te. Em di tiliya wî de bûbûn wekî gustîlekê, çawa dixwest dikaribû bizivirîne. Me demekê da pey rehmetiyê birayê te Îdrîs û pey te bi xwe jî, ne ji ber ku hûn demokrat bûn. Kesî ji we, yek rojê tenê jî bawerî bi vê gotinê neaniye. Piran ji me ev yek jî dizanibû û xwe nedan paş. Jixwe ev gotina demokrat di ferhenga eşirtiyê de, ji esas ve tune, dê çawa di eşirtên ew qas lipaşmayî wekî Barzanî û yên derdorên wê, wek Zêbar, Lolan, Nêrweyî de, hebe?

Tevî vê jî, vê neteweya merd, demeke dirêj xwe spart we û bi rêzgirtin serî ji we re ditewand û çavên xwe ji her şaşiyên we re digirtin. Ev cara yekemîn e, ku rêxistinên Başûr jî, hema bêje bi tevayî vê yekê, wekî xiyaret dinirxînin. Ev bi xwe guhertineke serûbin e, di bizava Başûr de. Dibe her ji ber vê be jî, ku dijminê yekemîn û axayê cîhanê, bi ew qas amade kirin û bi vê xurtiyê, diavêjin ser gerîlayên ku bûye hevîrtirşê van hemû guhertinan. Jixwe ev e jî, ya ku kîna we, ya bê binî li hemberî van keç û xortan, şîrove dike.



PIŞTÎ, brîngên Serkaniya Giştî (Genelkurmay) ya Artêşa Tirk û operasyona dagirkirina başûrê Kurdistanê, di nava mehekê de 4 şaxên Komeleyên Mafên Mirovan (IHD) hatin girtin. Piştî girtina IHD'yên Amed, Meletî û İzmirê roja 25'ê pûşperê, IHD'ya Konyayê jî ji hêla Dadgeha Ewlekariya Dewletê (DGM) ve hate girtin. Her wiha di heman rojê de, Serokê IHD'ya Ruhayê Azîz Durmaz jî bi îdîayên ku peywendiyên wî bi PKK'ê re hene û mirovan dişîne nav refên PKK'ê jî hêla polîsên siyasî ve hate binçavkirin. Ev yek jî aliyê derdorên demokratîk ve wekî nîşana niyeta dewletê ya ji bo weşartina sîcên xwe tê binavkirin. Rayedarên IHD'ê ev kirin, şermezar kirin.



WEZARETA Karên Hundirîn a Înglîstanê bi biryarekê daxuyand ku ewê Kanî Yılmaz bişîhin Almanyayê. Ev biryar bi biryara dedgehê ya roja 25'ê tîrmeha 1995'an ve tê girêdan. Li dijî vê helwesta wezarete, Kanî Yılmaz jî girtîgehê daxuyaniyek nivîskî jî raya giştî re şand û da zanîn ku ev biryar ne biryareke hiqûqî, lê biryareke siyasî ye. Yılmaz di daxuyaniya xwe de diyar dike ku, ew kesên ku di dema girtina wî de reaksiyon nîşan dabûn û ev kirin protesto kiribûn, di serî de jî Wezîrê Karên Derve Robîn Cook û gelek parlamenterên Partiya Karêrê iro bûne îqtîdar û biryara îadekirina wî dane. Yılmaz dide zanîn ku dewletên împeryalist bi kirinê wî nîkarin wî ji doza wî dûr bixin.

NÛÇE

Piştî şerê başûrê Kurdistanê PKK li Rojhilata Navîn bû hêzeke sereke

Cemil Gündoğan, der barê encamên dagirkirina Başûr de bal kişand ser berebaziya PKK'ê û PDK'ê ya ji bo nimîneriya gelê kurd di qada navneteweyî de û diyar kir ku PDK di vî warî de bi ser neketiye. Wî da zanîn ku piştî berxwedana gerîlayan a li dijî PDK'ê û Artêşa Tirk, gelê herêmê bi sêmpatî nêzikî PKK bibe.

Li Rojhilata Navîn, pêkhatina rûdanên balkêş û girîng didome. Piştî rûdanên dawîn mîrov dikare bibêje, herêm dibe navenda polîtîkaya cihanê. Bi taybetî DYA giraniya xwe dide ser Rojhilata Navîn. Ji ber vê yekê DYA'yê diplomatên xwe yê herî jêhatî û şarza dişîne herêmê.

Li dijî van planên welatên herêmê jî ji bo hevkarîyê tê dikoşin. Hefteya çûyî Wezîrê Tendurustiyê yê Iraqê çû serdana Îranê. Serokê Îranî Haşimî Rafsancanî Serokê Iraqê Saddam Huseyn vexwend Îranê.

Di vê refgirtinê de cihê Teverga Kurd jî di rojê Kurdistan û cihanê da ye. Ev yek piştî hevkarîya Îsraîl, Tirkîye, DYA û dagirkirina başûr bêhtir xwe dide pêş. Teverga Kurd li herêmê her diçe xurtir dibe û wekî hevalbendeke xwedîhêz tê hesibandin. Her wiha li başûrê welat jî Teverga Azadiyê her diçe bêhtir dibe hêzeke bingehîn.

Li ser vê mijarê Şewirmendê MIT'ê yê berê Prof. Dr. Mahîr Kaynak da zanîn ku operasyona dawî ji bo xurtkirina partiyê kurd hatiye lidarxistin û got ku Teverga Kurd êdî wekî hevalbendeke sereke tê pejirandin. Kaynak di dîmahîka axaftina xwe de ev nîrxandina balkêş kir: "Bi pêşbîniya min, bi giştî Teverga Kurd wê di nav hevalbendiya DYA, Îsraîl û Tirkîyeyê de cih bigire. PKK jî wekî alîgirê Iraq û Îranê xuya nake. DYA û Tirkîye jî tevde rastiya kurdan pejirandine. Problem di warê nîmandina kurdan da ye."

Li aliyê din nîrxandinên Nivîskar û Lêkolîner Cemil Gündoğan dîrî yê Kaynak in. Gündoğan bal kişand ser dijminatîya bêsînor a DYA û Îsraîlê ya li dijî Teverga Kurd û diyar kir ku hevalbendiyên ku li dijî Îsraîl, DYA û Tirkîyeyê pêk tên, ji bo Teverga Kurd ew qas baş in. Li gorî nîrxandina Gündoğan, Teverga Kurd dikare heya derekê di nav vî eniyê de cih bigire. Ji ber ku dijminatîya DYA û Îsraîlê rîyeke din jî bo Teverga Kurd nahêle.

Nivîskar Cemil Gündoğan, daxuyand ku digel ku Teverga Kurd li hundirîn xurt bûbû jî, di qada navneteweyî de heman tişt pêk nedihat. Nivîskarê kurd piştê da zanîn ku ji ber guherîna hevkeşeya di navbera hêzên Rojhilata Navîn de, ev rewş hêdî hêdî diguhere. Cemil Gündoğan bikaranîna moşekan wekî nîşana zêdebûna piştgiriya navneteweyî nîrxand. Gündoğan wisa berdewam kir: "Dewletên herêmê PKK'ê wekî kartekê navneteweyî dibînin. Her wiha Rûsya û hin dewletên Ewropayê jî ketine vê rêyê. Wan dewletan heta niha PKK wekî karteke di destê Hafîz Esad de diditin. Lê niha dibînin ku Teverga Kurdistanê Bakur di Rojhilata Navîn de xwedî wateyêke berfirehtir e û li gorî vê rastiye rewşa xwe jî nû ve dinirxînin."

Cemil Gündoğan, der barê encamên dagirkirina Başûr de jî bal kişand ser berebaziya PKK û PDK'ê ya ji bo nimîneriya gelê kurd di qada navneteweyî de û diyar kir ku PDK di vî warî de bi ser neketiye. Gündoğan got ku, piştgiriya PKK'ê di nav gelê kurd de zêdetir bûye. Ji aliyê din ve wî bi bir xist ku piştî dawetkirina Saddam prestîja PDK'ê jixwe kêm bûbû. Piştî berxwedana gerîlayan a li dijî PDK'ê û Artêşa Tirk, gelê herêmê jî berê zêdetir bi dilgermî û sêmpatî nêzikî PKK'ê dibe. Nivîskar Gündoğan gotina xwe ya li ser vê mijarê wiha bi dawî anî: "PDK ji bo ku PKK di warê serokatîya navneteweyî ya gelê kurd de pêş ve çû, zivêr bû û xwest ku bi alîkariya dewleta tirk ve rewşê biguherîne. Lê bi ser neket? Her wiha rêxistinên nêtar ên başûrî jî niha piştgiriya PKK'ê dikin."

Nûçeyên şer

Li aliyê din tevî ku piraniya hêzên tirk jî başûrê Kurdistanê vekîşin jî, çalakiyên gerîla kêman nebûn li gorî agahiyên bi dest ketine, ev çalakiyê pêk hatine: Di şerê de ku li Dihokê di navbera hêzên gerîla û PDK'ê de derket de Berpîrsê Asayîşê yê Dihokê Salih Berwarî hate kuştin. Li aliyê din li



PDK bi van bûyerên dawîn, ne tenê di warê leşkerî de di warê siyasî de jî li hemberî PKK'ê têk çû.

Çiyayê Spî konvoyeke leşkerî ya PDK'ê li mayînen girîlayan qelibî, li vir jî 6 PDK'yî mirin.

Hêzên PDK'yî piştî têkçûneke dijwar dest bi valakirina gundan kirin û 7 gund li herêma Heftanînê hatin valakirin. Li pey agahiyên xwecihî ev gund li gundên ku di bin bandora PDK'ê de ne tên bicihkirin.

Dîsa roja 18'ê pûşperê gerîlayan li herêma di navbera Şînex û Dihê de bi B-7'an êrîş birin ser çeperên hêzên Artêşa Tirk, di encama vî şerî de 7 leşker hatin kuştin. Hate ragihandin ku roja 22'yê pûşperê li herêma Rewandûzê şerê di navbera hêzên ARGK û PDK'ê de rû daye, di vî şerî de 8 PDK'yî hatine kuştin.

Li gorî agahiyên konvoyeke tîmên taybet roja 19'ê pûşperê li ser rîya Sason û Êlihê li mayînen gerîlayan qelibîye, 2 tîmên taybet bi navê Gula Mîr û Mehmet Can hatine kuştin. Li gorî agahiyên ev cerdevan, ên ku bûne tîmên taybet in.

Bi pey çavkaniyên xwecihî li ser rîya di navbera Culemêrg û Çelê de gerîlayan kemîn avêtine leşkerên tirk, di vê kemînê de 10 leşker hatine kuştin.

Hêzên gerîlayan ev du roj in ku ji beragêhên PDK'ê yê girîntirîn Gundê Tendurêk di bin dorpeçkirina gerîlayan da ye. Tê ragihandin ku gerîlayan jî sê mîlan ve bi katiyûşan êrîş birine ser gundê navborî. Li gorî agahiyên xwecihî hêzên PDK'yî di sê

deveran de ketine kemîna gerîlayan. Her wiha li herêma Hacî Ümman gerîlayên ARGK'ê bi piştgiriya Partiya Demokratîk a Sosyalîst ya Kurdistanê (PDSK) êrîş dibin ser binecihên PDK'ê, li ser xesara ku gihîştîye PDK'ê tu agahî bi dest neketin. Dîsa li herêma Sideka di kemîneke gerîlayan de 7 PDK'yî hatine kuştin. Li gorî agahiyên dawî di van pevçûnan de 41 KDP'yî hatine kuştin. Gerîlayan di navbera Perwarî û Çatakê de panzerêk rûxandine 2 leşker hatine kuştin.

Hate gotin ku gerîlayan roja 24'ê pûşperê bi çekên giran êrîş birine ser navçeya Amediye ya ku di bin desthilatdariya PDK'ê de ye. Gerîlayan piştî ku binecihên KDP'ê dane ber gule û roketan ji navçeyê vekîşiyane.

Dîsa li gorî ragihandina di şerê li Pasûr, Licê, Mêrdîn û Nisêbinê de 11 leşker hatine kuştin, gerîlayekî jî jiyana xwe winda kiriye. Her wiha trena ku di navbera Elezîz û Tatvanê de dixebite ji ber êrîşên gerîlayan ev 15 roj in naxebite.

Li Pasûra Amedê di şerê de 2 leşker hatine kuştin, gerîlayan êrîş birine ser Tesîsên Petrolê Ramanê 10 leşker hatine kuştin, 4 jî birîndar bûne. Li Mezgirta Dersimê jî di kemîneke gerîla de 3 leşker hatine kuştin.

NAVENDA NÛÇEYAN

Li nav malbatê girîngiya perwerdehiya zarokan



Zarok pêşeroja me ne. Em çendî zarokên xwe li ser bingehê rast perwerde bikin, wê pêşeroja me jî ew qas li pêş û bi serketî be. Zarok, wekî rûpeleke spî û paqij e. Li vê rûpela han çî bê nivîsîn wê li pêşerojê ew bê xwendin. Di jiyana mirov de, di warê exlaq, raman, meziyet û kesayeti de (ger erênî bin, ger neyînî bin) di bingeha wan de perwerdehiya dewra zarokati ya li nav malbatê veşariye.

Ji bo ku em nîşke îdeal ji pêşeroja xwe re amade bikin, pêwîst e ku em dest biavêjin vê pîrsê û di vî warî de guftûgo û nîqaşan bidin destpêkirin û malbatên xwe di vê mijarê de bi zanînen dorfireh û rast bixemilînin.

Perwerdehi di zikê dê de dest pê dike

Di jiyana mirov de roleke girîng a perwerdehiyê heye. Perwerdehiya bingehîn û ya herî girîng jî di dewra zarokati ya li nav malbatê dest pê dike. Li

jiyana pey zarokatiyê jî, bes ev perwerdehi merhelê-merhele tê temamkirin.

Li gorî zanyarên perwerdehiyê; kesekî, tiştên ku di jiyana xwe de fêr dibê, ji van % 70'yî wan li dewra zarokati û ji % 30 yê din jî di jiyana xwe ya mayî têdîgihêje.

Nifşên nû tîn wateya pêşveçûnê, nûbûnê û ramanên teze. Lê, dê û bavan bi nezanî keseyatiya wan qetil kirine, ruhê wan teslîm girtine. Ew wê keseyatiya wan bi dûr xistine. Gerek e neyê jibîrkin ku zarokên me ne mecbûr in ku bibin fotokopiya me. Wekî me biramin û tevbigerin.

Perwerdehiya zarokan di rehma dê de dest pê dike. Ger zikê jineke bi hemle bi hezkirin bê mizdan û maç kirin wê ew zarok di zikê dê de vê yekê hîs bike, ger li muzîkê bê guhdarkirin wê li pêşerojê aliyên zarok yê muzîkê hîn pêşketîr bin. Zarokê bi qandî ku hewceyî xwarin û vexwarinê ne, ew qas jî hewcedarî hezkirinê ne. Ev hezkirin jî,

gerek e di rehma dê de dest pê bike.

Du karakter

Em dema li dora xwe binihêrin, emê bibînin ku gelek mirov di bin bandora pîrsgirêkên kesayetiye de ne. Hinek kes hene ku tim ji axavtinê direvin. Her tim

guhdar bikin û dikarin fikrên xwe bi hêsanî îfade bikin. Ew cure kes, dipirsin û ji bersivandina pîrsan narevin. Dizanin rexne bikin, rexneyan hildigirin, her tim xwe nû dikin û riya fêrbûnê dişopînin. Ew kes bi xwe ewle ne.

Gelo, ev kes çima wisa ne? Ev tiştê xwezayî ye an dayîneke Xwedê ye? Di çêbûna wan karakteran de tesîra malbatê û perwerdehiya dewra zarokatiyê çendî heye? Me li jor gotibû: "Mirov tiştên ku di jiyana xwe de fêr dibê; ji % 70'yê wan di dewra zarokatiyê de hîn dibin." Wê demê em dikarin bibêjin ku, perwerdehiya dewra zarokatiyê ji % 70 tesîra xwe li ser çêbûna karakter û kesayetiya mirov dike.

Zarokek sê-çar salî

Werin em tev de ev car wan karakterên ku me li jor rêz kirin, em li dewra zarokatiya wan binihêrin: Karakterê neyînî: "Ev kes, hîn zarokek sê-çar salî ne. Hîn: nû dest bi fêrbûna axavtinê kirine. Gelek bi mîraq in."

di nav qalikê xwe de ne. Mirov, pîrsekê jî wan bike vediciniqin, di bersivdayînê de bi heyecan in, ser û çav li wan sor dibê, di nav xwêdanê de dimînin û zû dixitimîn. Meraqa fêrbûnê di wan de gelek kême e. Bi xwe ne ewle ne û êrişkar in.. Belkî jî fotokopiya dê û bavên xwe ne. Hinek kes jî hene; Bi xwe bawer in, lêgerîner in, dizanin li mirov

Tiştên li derdora wan diqewimin bi şiddet dixwazin fêr bibin û sedemên wan bizanibin. Bi qandî nan û avê hewceyî hînbûnê ne jî." Em bibêjin, ji dê an bavê xwe dipirsin:

- Ez çawa çêbûm?
- Me tu li çarşiyê kirî, an jî me tu li çolê ditîbû?
- Na, hehecîkan ew anîbû. Zarok nasekine û dipirse. Ev car (an dê an bav) wê bibêjin:
- De bes lo! Tu hew qas diaxivî. Te hişê me bir. Bes êdî..

Heta piraniya malbatan ji bo ku zarok bidin sekinandin lêdanê jî bi kar tînin.

Vê helwesta malbatê zarok ve ciniqandiye. Êdî riya fêrbûn û hînbûnê lê hatiye girtin. Xwestina zarok a pirs-kirinê xitimiye. Êdî tirs nas kiriye. Li şûna meraqa fêrbûn û hînbûnê û xwe îfadekirinê hestên şermokî, fedîkarî di dilê zarok de bi cih bûne. Ketîye nav qalikê xwe. Tirsonêk e. Êdî zarokêkî/ê nerehet û mizawir e. Êrîşkar e. Tiştên ku malbat naxwaze bike, ew hîn zêdetir dike. Di nava wî û malbatê de dijberiyên kûr çêbûne. Di vê şexsiyetê de bingeha taybetî ya karaktereke neyînî hatiye danîn.

Em li ser çêbûna karaktereke erênî rawestînin; careke din zarokeke sê-çar salî. Dixwaze her tiştî fêr bibe û dipirse:

- Ez çawa çêbûme?
- Binihêre berxê min. Ez û bavê te piştî ku em zewicîn, me xwest ku zarokên me çêbibin. Pêşî, xwişka te ya mezin çêbû. Paşê me xwest kurekî me jî çêbe. Çendekî paşê, ez bi te hemle mam. Min neh mehan tu di zikê xwe de xwedî kirî û paşê tu hafî dinê."

Zarok dipirse:

- Te Berfin jî neh mehan li di zikê xwe xwedî kir.
- Belê kurê min. Min ew jî neh mehan di zikê xwe de xwedî kir. Zarok dipirse:
- Bavo, Berfin çima sunet nebû?
- Bi tenê mêr sunet dibin. Keç sunet nabin. Berfin jî keç e.

Zarok tim dipirse. Her ku bersiv tînin dayîn, dawîya pirsên wî jî nayên. Lê, malbat bi sebir û aramî bi zimanekî ku zarok jê fêr bike, bi zimanekî fesîh, zelal û rast (hêke pirsên belewele bin jî) her tim guh didin pirsên zarok, wan pirsan dibersivînin. Zarok tê digihêje û xwe bi kontrol dike. Her ku bersiv wî tatmîn dikin, hîn zêde-



tir guhdarî dike. Hêdî, hêdî ewlebûn û baweriya kesayeti li ruhê wî rûdinin.

Rasti û Dirusti

Piraniya dê û bavên tim ji zarokên xwe re dibêjin: -Derew tişteki nebaş e. Tu car derewan nekin. Baş e. Lê, ku pênc deqîqe paşê derî lê bi keve û jinika cîran bêje:

- Cîrana min, mêvanên min hatine. Qehweya me qediyaye, tu dikarî hinek qehwe bidî min?

Diya zarok:

-Bawer bikî ya me jî qediyaye. Wê demê, wê zarok bêje:

-Dayê bavê min duh ji me re qehwe anîbû. Piştî ku jinika cîran here, wê careke din jinik ji zarok hêrs bibe û belkî lêxe jî. Wê demê wê zarok li nav mêjiyê xwe bi-

keve nava dijberiyê. Wê ji xwe re dibêje: "Diya min ji min re got; derew ne baş in. Lê, wê derew kir û min rast got. Ji bo ku min rast got, îcar li min da. Gelo, çi rast e?"

Ger dê û bav dixwazin zarokên wan xwedî bawerî û bi xwe ewle bin, divê ew zarokên xwe li ser bingehê rast perwerde bikin.

Gerek zarok fotokopiya dê û bav bin?

Malbat her tim dixwazin zarokên wan wekî wan bin. Heta, tiştên ku di dilê wan de bûne û wan nikaribûne bikin, dixwazin bi zarokên xwe bidin kirin. Ji ber vê helwesta han ji demekê şûn de, zarok ji kesayetiya xwe, şexsiyetiya xwe ya xweser der dikevin û di hundirê xwe de dê û bavê xwe dihewînin. Êdî ew kes ketine bin hestên tewanbariyê. Jixwe, pêşdaraziyên civakî jî tevli yê bandorê dibin. Û desthilatdariyek dijwar li ser kesayetiya zarokan a xweser pêk tînin. Êdî ew kes ne bi xwe tenê ne. Bi ku ve herin, li ku bin, çi karî bikin, dê û bavê wan jî di hundirê de wan de ne. Her tim mudexelêya daxwaz, raman û axaftinên wan dikin û wan rihet nahêlin. Tiştên ku ew kes rast dibînin û dixwazin bikin hebin jî, ji ber dê û bavê xwe yê di hundirê xwe dihewînin, nikarin bikin. Di hundirê şexsekî de êdî çend kes hene. Lewre jî ew kes bêbiryar e. Di her karî de dudil e. Heta nizanîm çend-dîl e. Êdî ew kes ne bi xwe tenê ye. Kesayetiya wî ne azad e.

Zarokên azad nîşana pêşerojê azad in

Niştên nû, tînin wateya pêşveçûnê, nûbûnê û ramanên teze. Lê, dê û bavên bi nezanî kesayetiya wan qetil kirine, ruhê wan teslîm girtine. Ew ji wê kesayetiya wan bi dûr xistine.

Gerek neyê jibîrkirin ku zarokên me ne mecbûr in ku bibin fotokopiya me. Wekî me biramin û tevbigerin. Bi zanîn û maharetên duhîn, karên îroyîn çareser nabin. Bihêlin bila zarokên me gavekê ji me pêşdetir bin. Êdî nexebitin da ku ew di xêza we de bimînin. Xwe nexin hundirê zarokên xwe. Û zarokên xwe bi xwe ve hefsar nekin. Zarokên serbixwe û azad, nîşana pêşeroja serbixwe û azad in.

SONGUL-ROŞAN LEZGÎN

Banga berpirsiyê

CELALETTİN YÖYLER



Gelî heval û hogirên birêz û bi rûmet (xwendevanên Rojnameya Azadiya Welat) ez, dixwazim di vê nivîsa xwe de, bi we xwendevanên hêja re bikevime nava hevpeyvîn û nixandinên gelêrî, welatî, çandî û neteweyî.

Gelî birayên birêz, werin em bi hev re çavên xwe vekin û li rewşa cîhanê û ya Rojhilata Navîn bigerin û temaşe bikin. A, çi dema ku em bi hûmêrîyên dîrokî, civakî û deverî li cîhanê û Rojhilata Navîn binêrin, emê, di nava wan nêrinên xwe de rastî bi hezaran reng û rewşên tevdigerên kesên werin.

Wekî çawa ku em, dibînin pirên kesên cîhanê û deverên din, xwedan çand, xwendin, û xwendegehên bi zimanê dayikên xwe ne. Her neteweyek bi zimanê xwe dixwîne, dinivîsîne û dipeyive. Lê em kurd? Em ên ku bi sedan sal in di binê bandora çand û wêjeya kesên biyan de mane, em çi dikin? Hinekî ji me bi ruhê 'ezîtiyê' yê ketine nava jiyana rojane, xwe tê de winda kirine û noq bûne nava gemariya xudîbiniya dîtin û ramanên xwe yê partîzantiyên hewayî.

Ewên bi vî rengî, pirên wan ji welat revîne û li doza serfiraziya gelê kurd xwedî derneketine. Pir mixabin ji bilî revê dijimî-nahiya xwe ya nemirovahî jî, ji xebatên gelêrî û neteweyî re, diyar kirine. Evên bi vî awayî li cur bi cûrên deverên Ewropayê xwedanên cih û war û otomobîlên xweşik û hevalên keçikên kej in.

Ew bi xuddîniyê û ezîtiya xwe ya bi gemar, guhên xwe jî nadine weşanên televîzyona neteweyî û dibêjin: "Ew televîzyon ne ya me ye." Her wisa ewên wisa "tîrîşîkxwar" weşanên çapemeniya neteweyî jî, naxwînin û napejirînin. Bi zanîna min ewên bi vê rewşê jî piştewaniya gelêrî in û her kesên xwenas wan baş dinase. Em werin ser xebata çapemeniya xwe, wê jî bi hev re binirxînin. Gelî hevalên xwendevanên Çapemeniya Kurd, ez wekî bira û hevlekî we, dixwazim gazin û rexneyên biratiyê bînim ser we xwendevanên birêz û hêja. Gelî hevalan hûn baş dizanin, ku rojnamevantiya çapemeniya gelê me gelekî dijwar û çetin e. Di wê riyê de bi sedan hevalên me, canên xwe yê pîroz gorîyê xebatê kirine û şehîd bûne.

Lê pir mixabin em li xebata wan a bi rûmet xwedî derneketine. Hem jî em xwe berpirsiyar nabinin ji bo xebata pêşvebirina nixên xwe yê çandî û serfirazî. Pir girîng û pêwîst e ku em xwendevanên çapemeniya gelêrî, li erkên xwe yê neteweyî xwedî derkevin. A, ez bi van raman û nixandînan wekî heval û birayekî we xwendevanên

"Azadiya Welat" li we banga berpirsiyariyê û lê xwedîderketina li rojnameyê dikim û dibêjim: Gelî hevalan ez bi navê xwedîtiya xwe ya fermî bi tenê, ne xwediyê vê rojnameyê me. Hem jî hevalên xebatkarên rojnameyê û yê kargerîyê bi tenê ne xebatkar û karkerên rojnameyê ne, hûn hemî xwendevan bi hev re digel me xwedî û xudanên vê rojnameyê ne. Divê hûn xwe bi tenê xwendevan nebînin, xwe xwedî û berpirsiyar bibînin. Lewre rojname ne ya burjûvaziyê an jî ya bazirganiya kesani ye. Ew her bi tenê rojnameya gelêrî û welatî û neteweyî ye. Banga min a neteweyî, biratî, ji we re ev e, ku hûn hemû berpirs bin ji bo pêşvebirina weşana rojnameyê.

Ji ber van sedeman rica û tikaya min ji we xwendevanan ev e, ku hûn xwe berpirs bibînin û her yek ji we di devera xwe de têkilî û peywendîyan bi kesên derdorên xwe re, bi heval û hogirên xwe re, bi lezim û pis-mamên xwe re, girê bidin û firtanê rojnameyê fireh û pir bikin. Ev jî pêdiviyekê gelêrî û neteweyî ye.

Dîsa rica û tikaya min ji we ev e ku hûn di nêzik de encamên xebatên xwe bi riya navnîşana rojnameyê binivîsin û me bi xebatên xwe yê ji bo bilindkirina tîraja rojnameyê agahdar bikin. Li benda xebat û agahiyên we me. Silav rêz û rûmet jî bo we hemûyan.

Şehîdê Ruha embaz Halil Özalp

Xelil Riha ra bi. Wexto ke, qeçek biyo malbata xo ya piya her ser şîyo Çukurova û erdanê pemî de xeftiyayo. Ey kiştê ra wendê û kiştê ra jî qandê debarê (geçimi-ni) xo, welatê xerîbî de karkerîn kerdê. Riha de jî, boyaxê sewlan (nemiyan) kerdê û simîfî rotê. Embaz Xelîl, zey qeçanê Kurdistanî, ê bînan no hala bibi gird. Coka jî embazê Xelîlî, vêşî qîmet dayê zanayina sosyalîzmî. Ey tim û tim vatê: "Bê raya sosyalîzmî, çîyo ke şarê ma bireyno çîniyo." Ewnayina embazê Xelîlî wardiyîn de jî biyayin bi.

Sera 1989 de, embaz Xelîl bi wendoxê Fakûlta Hûqûqê Zankeyê (universite) Marmarî. Xora Embazî xo jî waştê ke na fakûlta biqedîno û wa awûqat bo. La belê, ê seran de adirê reyayinî, Kurdistan de winî gird bibi ke; wendoxê kurdî jî kewtê tesîr dê ci û unîwerstan de qandê kom-biyayinê xo xeftiyayê. O wext de wendoxê mayê welatperweran ra jew jî Embazo Xelîl bi. O hezar zahmeta amebi na fakûlta ke, wa bibo awûqat. La belê ey reyayina xo, reyayina şarê xo de dîbi. Cokra jî ey awûqatîna xo sere ra vet û bi şeroşgerê Kurdistanî.

Ma grewê veyşanî de pê silasna. A ser; Amed, Adna, İzmir, Enqere, Stenbol û xeylê ca de, hezarana mardimî kewtî grewê veyşanî ke, dewleta Tirk biryanê xo yê koçkerden û sansurî (ss kararnemeleri) û teşîyayan sera zilmî hewado. Coka jî ma û Embazê Xelîliya piya partiya HEP'a Stenbolî de kewtîm grewê veyşanî. Nezdîyê hefteyê şew û roj, ma pê hetek mendîm. Badê grewî jî embazîna ma ramit. Embazîna ey jî zaf germî kes ci ra nêcizyayê û zaf bawerîna dayê kesî.

Embazê ke, kewtê grewî, biyê tewrdê şarî û rewşê siyasetê ma sero vinderdê. Şarê ma jî, qeç û qûlanê xo ya, şew û roj ameyê meymanînda ma ke; grewê veyşanî veng bi do. Qorê merdimî ameyê û qorê jî şîyê. O wext ca çinebi kes xo biluno. Embazê Xelîlî, wextê nê grewî miyan de, zey zelqetana xeftiyayê. Embazî hete, ecizyayin çînebi. Jû jû fin odandê parî de komî viraştê û zey zanekarana raya şeroşgerîna mûsnayê înan, û jû jû fin jî, ê komî ardê wertedê, girewkarana û şar werzaynayê govend.

Embaz Xelîl nîna jî nêvinderdê. Çimkî embaz Xelîl grewkarê şeroşker bi.

Finê mi ci rê vat: "Embaz tiyê zaf xeftiyenê, ek ti wina bixeftiyê, benê nêweş; xo vîra meke tiyê grewê veyşanî de, barê heveyê roşî û xo rê arasi." Wexto ke, mi wina vat, embaz Xelîl zey verî wiya û wina vat: "Şima nêkewê kaxûdê mi, ganê mi bi hukmê xeftiyayinê ameyno no hal. Ma no karo ke, şimayê mi rê vanê tayan bixeftiyê? Gerek ma dijminî rê vêşî bixeftiyê ke, bandorkerî peyd ling çekrê. A bîn jî, ek ma nê îmkanî ra, bişê çiyê wedarnê, o wext na veyşaniya ma çareser bena." Min ewna ke, o yo, xeftiyayinî ra kêfweş beno. Cokra jî min ci rê wina vat: "Embaz, tiyê ma ra vêşî, xo zanê. La belê embazî vanê ke, wa Embaz xelîl xo vêşî nêtewno." Na waştina embazan sero, Xelîlî no fin wina vat: "Nê nê embaz. Ez xo zana, çimhal ganê mi bibo giran, ez o çax arese na."

Embaz Xelîl kotî biyayê, wija biyê şên. Ey veyşaniya xo ya, biyê tewrdê meymanan û govend tepîştê. Çend ke, ci dest ra ameyê, şehîdan sero deyrî vatê û ê ardê ma vîrî. Ey vatê: "Şehîdê ma rûmetê mayê, şehîdê ma jûwîna şarê mayê. Wa ê, tim û tim wa şewqê reyayinê şarê mabê." Embaz Xelîl, nê vatenanê xo de jî, ayseho ke, embazeko zanekar o. Kiştê zaneyir de jî, o hewl bi.

Jû jû fin jî, siyasetkarê reformîstî, ameyê meymaniya grewê veyşanî. Wexto ke, ê ameyê, embazan Xelîlî rê vatê: "Embaz mardimê to amey, şo înan het." Xelîlî jî, embazan rê wina vatê: "Wabo embaz, ek ewro iyê wazenê çiyê bikrê, ezo jî destanê xo û zerya xo ya birayin înan rê dergkirî ke wa ê bizanê, raya ma û waştina ma de çewtin çîniya. Viradê wa ê ma bisilasnê. Ez bawera ke, iyê nêwetanê mawa bixeftiyê. La belê, ê jî zanê ke; raya înan şeroş moreş nêbeno. Vindrê wa şarê ma jî înan rind bisilasnê. Fikrê mi wina yo." Embaz Xelîl, vatenanê embazan ra, qe nêqahriyayê. Ey rind zanayê ke, qahra qe teva nêbeno.

Embaz Xelîl, bah-doyê grewê veyşanî vejya koyan ser û bi tewrdê gerîlayan. O jî zey vatenanê xo, ganê xo ya, bi rûmetê şarê ma. Sera 1992 de, Sûka Semsûrî de embazanê xo ya piya wazeno ke, lara ravêro kiştê bîn, la bele embaz Xelîl, aw ver de şîno û beno şehîdê şeroşê Kurdistanî.



Ewro bawerî, û girêdayîn bi adirê ganê şima, berz beno; koyan de, sûkan de. Embaz Xelîl

Wa ti, û egîtê bêmerdî bizanê ke, vengê şeroşî; seranserê Kurdistanî de, awa beno. Heval Xelîl


Adir, gunî û ganê şeroşgerana, çahar kiştê, Kurdistanî sûr keno. Birayê Xelîl

Şar û gerîla, bisondê girdiya, pay bi pay û ver bi ver, çekenê Kurdistan ra; bandonkeran û çimkewtan. Şehîd Xelîl

Ew her yek parçeyek ji axa welat in Her yek lehengek e. Ew gulên Kurdistaneke azad û niştiman in. Ew; wê di civateke azad de wekî guleke geş bijîn. Wekî guleke sor wê her quncê civatê bixemilînin."

Belê şehîd ronahiya jîyanê ye Heval Selahattin Üçkardeş li Stenbolê şehîd ket. Bîranîna wî heta hetayê wê jîndar be.

Ji Girtîgeha Bartîne hevalên wî yên şeroşê İzzet Baykal-Çetin Arkaş-Melik Karaç



Selahattin Üçkardeş (1967 - 22 Gulan 1997)



- 29.06.1982: Dewleta Israîlê Lubnan dagir kir.
- 30.06.1996: Êrişa xwefedayî ya yekemîn a PKK'ê, ji aliyê Zeynep Kinacı (Zilan) ve li Dêrsimê hate lidarxistin. Di vê çalakîyê de 7 leşkerên ku di merasîma alê de bûn hatin kuştin, bi dehan leşker jî birîndar bûn.
- 02.07.1993: Hotêla Madimakê ku gelek hunermend û rewşenbîrên ku ji bo şahîya Pîr Sultan Abda çûbûne Sêwazê lê diman, ji ber axaftineke Azîz Nesîn, ji hêla olperest û kevneperestan ve hate şewitandin. Di encamê de Azîz Nesîn sax filitî, lê 37 kesî di vê êrişê hovanê de can dan.

- 02.07.1995: Rayedar û delegeyê HEP û DEP'a Batmanê yê berê û delegeyê HADEP'a Edeneyê İzzettîn Görnü ji hêla kontrayan ve li ser "Çukurova caddesi" ya Edene yê hate kuştin.
- 04.07.1980: Li Çorumê faşîstên tirk, li dijî alewiyan qetlîam li dar xistin.
- 04.07.1966: Rewşenbîr, siyasetvan û nivîskarê Kurd Faik Bucak ji hêla MIT'a Tirkiyeyê ve li Rihayê hate kuştin.
- 04.07.1994: Serokê TÛM-BEL-SEN'a İzmîrê, welatparêzê Kurd İkrâm Mihyaz li navenda İzmîrê ji hêla hêzên tarî ve hate qetilkirin.

AWIR

Gel li benda rojnameya xwe ye



Axaftina vekirinê ji hêla Koordînatore Demokrasiyê Birêz Aslan Yıldız ve hat kirin. Yıldız, pêşî ji ber eleqe û alîkariya ku gel dide rojnameyê, sipasiyên xwe pêşkêşî gel kir

Roja 16'ê pûşperê, Nûneriya Rojnameya Demokrasiya ku bi fermana dewletê hatibû girtin, ji bo piştgiya rojnameyê şahiyek bi xwarin li dar xist. Ev çalakî li NÇM'ya İzmîrê pêk hat û wekî "Em dikarin hemû nixan bi hev re biafirînin" hat binavkirin. Gel bi çêşeke mezin beşdarî çalakîyê bû, lê ji ber tengbûna hêwana (salon) NÇM'ê, gelek mirov li derve man.

Axaftina vekirinê ji hêla Koordînatore Demokrasiyê Birêz Aslan Yıldız ve hat kirin. Yıldız, pêşî ji ber eleqe-û alîkariya ku gel dide rojnameyê, sipasiyên xwe pêşkêşî gel kir û bi kurtî axivî: "Her wekî çawa hin kes xwe ji bo girtina rojnameyên dijber serbest dibînin, em jî xwe ji bo derxistina rojname û kovarên nû serbest dibînin. Sedemê ku rojnameya me pê hatiye girtin hemû dinya dizane. Ji hêla din ve jî, ji bo ku dagirkirina başûrê Kurdistanê, bê veşartin û raya giştî negihe nûçe û agahiyên rastîn Rojnameya Demokrasi hat girtin."

Dû re ji aliyê gerinendeyê rojnameya ku wê nû derkeve birêz Erdem Ünal hinek xelat hat dayin. Ev xelat sazîyên

ku alîkariya piştgiya rojnameyê kirine wekî HADEP, NÇM, TAY-DER û ÖDP'ê girtin û wan jî xebatkarên rojnameya Kurd pîroz kirin û ji bo rojnameya ku wê derkeve serfirazî xwestin.

Divê roja şadî de Koroya Zarokên NÇM'ê sirûda "Herne pêş" diyarî gel kir û daxuyand ku wê bi derketina rojnameyê nû têkoşîna gelê Kurd her dem pêşve biçê.

Hozan Cezmi, çend stran pêşkêşî gel kirin. Berî ku stranên xwe bibêje, wî got ku, ew van stranên diyarî pakrewanên çapemeniya azad dikê. Piştî Hozan Cezmî, Grup Gümüşî derket ser sehnê, bi zimanê tirkî û Kurdî stranên xwe gotin û diyar kir ku wê serfirazî bibê ya stranên me. Di vê rojê de beşdariyê herî bi wate hebû: Ji gelê çerkez (Balıkesir) Adigê birêz Sevînc Baykan, bi straneke gelê xwe alîkarî û biratiya gelan nîşan da û bi zimanê çerkezî xwend. Ew helbest ji hêla temaşevanan ve gelekî hate ecibandin.

Bi çalakîyên ve rojê re hat xuyakirin ku gelê Kurd, di girîngiya rojnameya rojane gihîştîye û bi çar çavan rîya rojnameya xwe dipê.

FERECÊ HEMÊ FEREC

ÇAVDÊRÎ

AMED TÎGRÎS



"Zanabûna kurdan li ser Beşikçi kêm û kevn e!"

Çend roj berê li Swêdê ji bo azadî û serbestberdana İsmail Beşikçi çalakîyê mezîn û berfireh hat lidarxistin. Komîteya amadekar a vê çalakîyê ji çend nivîskar, hunermend û Înstîtuya Kurdî li Stockholmê pêk hat. Li bajarên Stockholm, Uppsala û Eskilstunayê gelek Kurd û swêdî beşdarî çalakîyê bûn.

Komîteya amadekar, ji bo beşdarbûna semînerê ji Tirkiyê Serokê Komela Mafên Mirovan Akın Birdal, parêzvanê (avukatê) İsmail Beşikçi Levend Kanat û berpirsiyarê weşanên pirtûkên İsmail Beşikçi Ünsal Öztürk wiha digot:

"Ez niha baş dibînim ku zanabûna kurdan li ser pirtûkên İsmail Beşikçi gelek kêm û kevn e. Hin gelek Kurd nizanin ka çend pirtûkên İsmail Beşikçi derketine û çend ji wan hatine mehkeme û ceza kirin. Heta niha 35 pirtûkên İ. Beşikçi derketine û hemû jî li ser pîrsa kurdan in. Der heqê hinek pirtûkan de ne carekê çend caran mehkeme hatine kirin û Beşikçi ji bo wan bi salan di girtîgehê de razabû. Lê piştî cuntayê carekê din der heqê eynî pirtûkan de mehkeme hatine vekirin û cara duyemîn jî ceza hatine dayin. Her wiha Beşikçi ji pirtûkekê çend caran ceza girtîye. Bêdadiyê wiha li tu derê dinyayê nehatiye dîtin. Mesela heta niha der heqê 41 pirtûkên wî de 62 dawê û mehkeme hatine vekirin. Ji derî van pirtûkan, heta niha 105 dawê û mehkeme li İ. Beşikçi hatine vekirin.

Ji bo İsmail Beşikçi tu qanûn manûnên tirk ên sabît tune ne. Dilê wan çawan bixwaze wiha ceza lê dibarînin. Di sala 1990'î de pirtûka wî ya "Türk-Tarih Tezi" hat weşandin. Mehkeme li gor qanûna xwe ya ku hene ceza neda vê pirtûkê. Li gor qanûnê bi giştî qîmeta vê pirtûkê 13 milyon bû. Lê mehkemeyê çî kir, 150 milyon ceza da pirtûkê. Ji aliyê din ve dema cezayê pere didin pirtûkê, hem dide min û hem jî didin Beşikçi. Mesela ji bo pirtûka "Türk Tarih Tezi" 100 milyon ceza dan Beşikçi û 50 milyon jî dan min. Dîsa cezayê Beşikçi ji yê min zêdetir e..."

Rast e zanîna kurdan li ser İsmail Beşikçi hem kêm û kevn e û hem jî Kurd baş li İsmail Beşikçi xwedî derketine û dernakevin. Nivîskar İsmail Beşikçi heta niha 15 salan di zîndanê de maye. Cezayên ku heta niha diyar bûne 103 sal cezayê zîndanî û bi milyaran jî divê ew cezayê pereyî bide. Hin mehkeme dewam dikin. Beşikçi niha li zîdana bajarê Bursayê ye. Beşikçi hemû jiyana xwe ya hêja û giranbiha ji bo doza Kurdên ku bi tirkî nizanin (ku îro piraniya kurdan bi tirkî nizanin), ew der heqê bîr û bawerî û têkoşîna Beşikçi de bi tenê xwediyê çend gotinan in. Ji ber ku heta niha ji wan 35 pirtûkên Beşikçi bi tenê pirtûkekê wî bî Kurdî (Çend Gotin li Ser Ronakbîrên Kurd, Wergera Amed Tîgrîs û J. Espar-Stockholm-1991) heye. Xû û karetereke Beşikçi heye ku ew tu alîkariyê madî qebûl nakê, li cihê name, kartek li ba dilê wî gelek mezin û pîroz e. Bi nameyekê be jî divê em Kurd Beşikçi ji bîr nekin!

Ma qey piştî mirina mirovên hêja û giranbiha peykerên (heykelên) wan tên çêkirin? Bi dîtin min heger edet û prensîb wiha be jî, divê em Kurd ve edete ji navê rakin û ji niha ve peykera Xoce (1) bidin çêkirin! Ez dizanim dê Xoce bi wê peykerê dilşa nebe, lê dê bi milyonan Kurd pê dilşa bibin û peykerê wî yê hêja deynin ser televizyonên xwe. Her ku bibînin dê bêjin "Rojbaş Xoce! Tu çawan î?"

1) Kurd ji İsmail Beşikçi re "Xoce" yanî Mamoste dibêjin. Ev jî ji ber rêzgirtina wî ye.

Rojnameger û nivîskar Mehmet AKTAŞ:

Nivîsandin ji xwe hesap pirsîn e

Te hiqûq xwendiyê, tu rojnamegeriyê dikî, lê meyla te li ser nivîskariyê heye, tu xwe bêhtir nêzikî kîjan karî dibînî?

● Nivîsandin ji bo min perçeyekî jiyane ye. Yanê çalakiyek e ku li hemberî jiyane bertekiyên min zêde dike. Karê min ne nivîskariyê ye. Bi çavê rojnamevanekî jî zêde li xwe nanêrim. Pêdiviyên têkoşîna rizgariyê, rojnamegeriyê bi mirov dide kirin.

Di dilê te de çi hebû ku tu bikî?

● Ez dixwazim xîtabî aliyê xwe yî mirovî bikim û wî bi xwendevanan re parve bikim. Ez vê yekê jî bêhtir bi nivîsandinê dikarim pêk bînim. Dema ez dinivîsim xwe ji dema axaftinê azatir dibînim.

Tu çi dinivîsî?

● Tiştên ku heta niha min nivîsandine, bêhtir çavdêrî ne. Yek caran min hestên xwe jî bi ser van çavdêriyan ve kirin. Lê, niha dixwazim bi giranî rêwîtiyên me yê navxweyî binivîsim.

Rêwîtiyên me yê navxweyî çi ne?

● Yanê em di nav xwe de çi di-kin, dixwazim wan binivîsim.

Te got ku mirov dema dinivîse, xwe ji dema axaftinê azatir hîs dike.

tên di dilê xwe de bi devkî bînin zimên. Min ev yek bi giranî di nivîskarên kurd de dît.

Baş e, tu bi nivîskarên kurd re vê azadiya ku tu behs dikî, dibînî an na?

● Min ev jî bo xwe got. Ez xwe azatir dibînim di dema nivîsandinê de. Di nivîskarên kurd de bi giştî, tipê fabrikasyon bêhtir derketiye pêş.

Nivîs-

dane, hene?

● Melayê Cizîrî tê bîra min. Ew dil berdide keçekê, hestên xwe rasterast nikare jê re bîne zî-

şî xwedeveanan bikî an na, ev jî pirseke din e. Di nav wêjevan û nivîskarên kurd ên nûjen de navekî wisa nayê bîra min. Dibe ku hinekî Rojen Barnas ê ku li Swêdê dijî xwedî van xisletan be. Ew hindik dipeyive û bi giranî bi nivîsandinê xwe îfade dike.

Di civaka kurd de çima nivîskarên wisa tunene?

● Li cem me peyvkujiyek heye. Dibe ku hin kes vê yekê wekî paşgotinî bi nav bikin, hinên din jî dikarin nayekî din li vê peyvkujiyê deynin. Di civaka me de di nav gel de kevneşopiya folklorê, ji berê ve bi cih bûye. Gel nêrîn û hestên xwe, xwestek û derdê xwe bi stran û çîrokên devkî tîne zimên. Lê belê di kurdên xwende de, ev çand baş bi cih nebûye. Li aliyê din, dibe ku tu her tim nikaribî bi devkî, xwe baş îfade bikî. Yanî cihana peyven nivîsandinê dewlementir e.

Tu ji kîjan nivîskaran hez dikî?

● Ez xwe gelekî nêzikî romanivîs, Mehmet Eroğlu dibînim. Wêjeya Amerîkaya Latîn jî ji bo min gelek balkêş e. Nivîskar û her wiha rojnamevanê Uruguayî Eduardo Galínî pir tesîr li min kiribû. Ew rojnamegerî û wêjeyê, pir baş li hev tîne. Wekî din, ji Ame-

Lê belê nivîsandin gotarên ji bo gelemperî ne, dema yek dinivîse xwe û ramanên xwe hinek bi sînor nake?

● Di civakên me yê Rohhilata Navîn de esas, çanda axaftinê zêdetir pêl daye. Ev yek di awira pêşî de wekî azadiyê tê xuyakirin.

Di rastiyê de em li pêşberî komên mirovan bêhtir sloganên diavêjin. Em jar û qels dimînin, dema ku em dixwazin tiş-

karî û nivîskariya fabrikasyonê li hev û din tîne?

● Her nivîskar ji ber egerekê dest bi nivîsandinê dike. Ev eger pêdiviyek e an jî xwestekeke wisa ye ku nayê îfadekirin. Lê belê di sa jî hin-kes dibe ku dû re, fêrî nivîskariyê bibin. Mirov vê yekê jî nikare di ser guhê xwe re biavêje.

Ji bo xwegihandinê azadiyê nivîskarên me yê ku serî li rîya nivîsandinê

mên, lê belê bi van hestên xwe, di wêjeya kurdî de şaheserekê diafirîne. Evîna xwe bi sembolan, bi zimanekî xurt û bedew tîne zimên. Dibe ku bi hezaran navgînên nivîsandinê hebin. Mirov di nivîsandinê de dikare ji aforîzmaya, ji sembolan û hwd. sîdê wergire. Nivîsandina rastîn, xwe-rîhetkirin û deşarjbûn e. Ew her wiha jî xwe hesap pirsîn û dilê xwe vekirin e. Nivîsandin parvekirina tenêtiyê ye. Ev tiştên tu dinivîsî; tê wan pêşkê-

rîkaya Latîn M. Bundeskî jî ji bo min nivîskarekî pir hêja ye. Bi giranî nivîskarên hemdem tesîr li min kirin. Lê belê ji bo min cihê Dostoyevskî cuda ye.

Van nivîskaran çima tesir li ser te hîştine?

● Mirovên ku dinivîsin bi piranî xwe bi destê hestêke wiha ve ber didin: Dema tu nivîskarekî dixwîni, ji nîşka ve tu dibêjî haa... bi rastî min jî xwestibû ez vî

tiştî bi awayê wî nivîskarî bînim zimên, lê belê wî ev nêrîn berî min nivîsiye. Dema min ev nivîskar xwendin, ez di nav hestên wisa de jiyam.

Çima mirov ji nivîskarên nêzîkî xwe hez dike? Dema tu van ên dûrî xwe dixwînî, tu tiştên cihêreng ku nefikiriyî û ne jiyayî, fêr dibî. Ev cihêrengî û nûbûn gelo ne balkêştir in?

● Niha tu nivîskar be jî, ne nivîskar be jî, di encamê de çiroka te ya mirovahiye, yanê serpêhatiyên tu dijî, girîng in. Bo nîmûne, xisûsiyeteke hevpar a Galiano û Mehmet Eroğlu heye. Li jiyana xwe ya borî dikolin, wê rûdînin ser kursiya pirsariyê. Jiyana borî, rabirdû min jî eleqedar dike. Ji ber ku ew dîroka mirovan a xisûsî girîng e. Nivîskarên ku ji bo xwe perwerdekar jî dibînim hene. Mesela Tolstoy mesela Faulkner

Dîroka xisûsî ya mirov çî ye çiqas girîng e?

● Ez zen dikim ku felaketa herî mezin a mirovekî ew e ku pêwendiyên wî ji rabirdû bêne birîn. Ji ber ku tiştê ku mirov ji xwe re dike biyan jî, ev qutbûna ji rabirdû ye. Eger îro di serê me de hin pirsên nebersivandî hebin, ev nîşan dide ku me di nav herikîna demê de, bersiva hîn pirsan nedaye û ew hemû di quncikekî mejiyê xwe de kom kirine û niha ew li benda bersivan in.

Pirsariyê an jî tevdana jiyana borî, bi awayekî, darizandina wê ye. Tu ji kîjan aliyê ve rabirdûya xwe didarizî?

● Dibe ku min li hin wêneyên ku ketine jiyana min, têr mêze nekiriye. Ez bi vê yekê diêşim û ji xwe re dibejim, xwezî min hinekî din li wan wêneyan binêrta, ji bo ku ew di serê min de baş bi gewde bibûna.

Weke çî?

● Hemû tiştên temam nebûyî. Meşên neqediyayî, tiştên nivcomayî min diêşînin. Diviyabû min hin rêwitiyên destpêkirî bibirina heta dawiyê.

Nexwe ka ez te bibim ber bi hin jiyanên berbiçav. Em behsa rêwitiya te ya rojnamegeriyê bikin. Rêwitiya ku ji Tirkiyeyê dest pê kir û di navbera Tirkiye û Kurdistanê de rê dipîva. Ji wir jî emê ber bi jiyana mişextî ve werin. Dema tu bi awireke giştî ji Ewrûpa li rêwitiya rojên borî dinêrî, pêşî kîjan wêne tîr ber çavên te?

● Bi rasthatinekê min dest bi rojnamegeriyê kir. Min lîse li Stenbolê dixwend. Mêrê mamosteya min a wêjeyê (edebiyat) di kovareke çepgir de dixebitî. Hingê wê ji min pirsî ka ez dixwazim di kovara "Yeni Gündemê" de bixebitim an na. Min bi wî awayî dest bi rojnamegeriyê kir. Di pey re, di kovara "Tempo" de, çend mehan jî di kovara "Sokak"ê de xebitîm. Ji zanîngehê, hevalekî min behsa Yeni Ülke kir; got, pêdivî bi rojnamevanên kurd heye. Li ser vê yekê min jî Yeni Ülke ji nû ve rahişt karê rojnamevanîyê. Xebitîna di rojnameyê ku nûçeyên li ser kurdan sansûr nake de, ji bo min heyecaneke mezin bû. Hingê, dema serhildanan bû. Demeke liv û biserxwe-

vehatinê bû. Min bi saya 'Yeni Ülke' Kurdistan jî baş nas kir. Ji ber ku ji demeke dirêj ve bû, ez li Stenbolê dijiyam.

Di Yeni Ülke de gelek hevpeyvîn û nivîsên te yê cihêreng hatin weşandin. Bo nîmûne, kesên apolîtîk û yê ku nikarin wekî mirovên normal di nav civakê de bijîn, te li ser wan kesan dinivîsand. Te bi kîjan mentiqî li ser jiyana kesên wisa ji şer û têkoşinê dûrketî dinivîsand?

● Berî her tiştî, xwestekeke mezin bi

şer heye, eger tunebe çima, eger hebe çiqas û çawa. Ez ji jiyana û cîhana kesan, kesên çî di nava şer de, çî jî, ne di nav şer de ne, gelek tişt fêr bûm. Ez bawer dikim ku jiyana jineke kurd, jiyana karkerekî kurd ê ku di înşeata de dixebite, dikare gelek tiştan fêrî me bike. Helbet her wiha jiyana ronakbîran jî girîng bû. Yanî mesele ne tenê her du bereyên şer bû. Ji berê ve ez bi rojnamegeriya li ser beyanatan avabûyî, tengazar dibim.

Di navbera rojnamegeriya ku li Kur-

Melayê Cizîrî tê bîra min. Ew dil berdide keçekê, hestên xwe rasterast nikare jê re bîne zimên, lê belê bi van hestên xwe, di wêjeya kurdî de şaheserekê diafirîne. Evîna xwe bi sembolan, bi zimanekî xurt û bedew tîne zimên. Dibe ku bi hezaran navgînên nivîsandinê hebin. Mirov di nivîsandinê de dikare jî aforîzmaya, jî sembolan û hwd. sûtê wergire.



Hevalên ku li Kurdistanê dixebitîn, aliyê wan ê welatparêzî li pêşiya rojnamegeriyê bû. Di salên 90'î de rojnamegerên kurd berî her tiştî pêwîst bû li hemberî îşkenceyê zexim bûna û karibûna li ber xwe bidin. Yanî pêwîst bû hemû tirsên xwe yê bi dewletê re eleqedar, bişikandana. Şikandina tirsê, fedakarî û cesaret şertên sereke bûn ji bo wan.

min re hebû ji bo ku ez kurdan bi tevahî kişî bikim. Li aliyekî min dixwest ez dîroka Kurdistanê fêr bibim û hemû bir û civatên gelê kurd nas bikim û ji wan fêr bikim. Ev yek. Ya duduya jî, eger li welatekî şer hebe, û tu bi xwazî radeya şidetê şer bipîvî, ne bes e ku tu çavdêriya eniyên tûj ên di nav şer de bikî, her wiha divê tu bir û civatên ku li paş eniya şer in jî, nas bikî. Yanî divê tu bandora şer a li ser kesên ku ne di nav şer de ne jî, bipîvî. Ji ber ku bi vî awayî mirov dikare bi hêsaniyê pê derfîna ka şidet û bandora şer gihaye ta kîjan rade û astê. Mesela şerê li Kurdistanê dikare çiqas tesîrê li kurdekî qebedayî an jî kurdekî ji rêze yê ku li Beyoğluya Stenbolê dijîn bike. An jî barkêşekî ku li Çağaloğluya Stenbolê ji serê sibê ta êvarê kar dike, haya wî çî qas ji-

distanê û Tirkiyeyê dihate pêkanîn de çî cudahiyan berbiçav hebûn, hene?

● Dî destpêkê de, rojnamegeriya ku li metropolan me li ser navê kurdan dikir ji ya ku li Kurdistanê dihate kirin, pir cuda bû. Berî her tiştî em pir rihet bûn û me bê dijwariyên mezin dikaribû hereket bikira. Xebatkaren me yê li metropolan ji aliyê rojnamegeriyê ve jî, ji yê li Kurdistanê gihîştî bûn, bêhtir perwerdehî dîtûn an jî ji berê ve rojnamegerî kiribûn. Her çî li Kurdistanê hevalên ku li Kurdistanê dixebitîn, aliyê wan ê welatparêzî li pêşiya rojnamegeriyê bû. Di salên 90'î de rojnamegerên kurd berî her tiştî pêwîst bû li hemberî îşkenceyê zexim bûna û karibûna li ber xwe bidin. Yanî pêwîst bû hemû tirsên xwe yê bi dewletê re eleqedar bişikandana. Şi-

kandina tirsê, fedakarî û cesaret şertên sereke bûn ji bo rojnamegeriyê. Bi kurtî wê demê (û îro jî wisa ye) rojnameger wekî gerilayê bêçek dihate ravekirin, bi dîtina min ew, raveyê rast bû. Li Kurdistanê bedelek giran a rojnamegeriyê hebû. Hevalên me yê li Kurdistanê di nav demê de rojnamegeriya xwe jî bi pêş ve birin. Lê dîsa jî, tecrûbeyên me zêde komî ser hev nebûn. Ev, handikapa herî mezin a medyaya kurd bû.

Taybetiya sereke ya rojnamegeriya me ya li Ewrûpa çî ye?

● Bi giştî rojnamegeriya li vê derê bi zimanekî tûjtir tê pêkanîn.

Ji bo te çî guherî, bi hatina te ya Ewrûpa re?

● Min li Ewrûpayê zêde rojnamegerî nekir. Ez xwe bi siûd dibînim. Ji ber ku min gelek fersend dîtî ku ez derkevim derveyê Ewrûpayê. Wekî din li Ewrûpayê jî ez zêde li cihekî ranawestiyam, ji ber vê yekê rewşa min hinekî cihêreng e ji ya rojnamevanên kurd ên li Ewrûpayê. Di MED-TV de ev nêzîkî du sal in ku ez dixebitîm, di vê demê de piraniya rojên min li derve derbas bûn, an li welatên bakur ên Ewrûpayê, an li Rojhilata Navîn û Kurdistanê an jî li welatên Sovyeta berê û Qafqasan min rojnamevanî kir. Rojnamegeriya biliv û ya di nav şertên xwezahê û di nav gel de bêhtir zewqê dide min. Lê dîsa jî kêmasiya hin hestan heye li vir. Li Tirkiyeyê û Kurdistanê, me baş dizanibû ku bedeleke rojnamegeriya me heye. Vê yekê bêguman heyecaneke bi me re peyda dikir û înadek bi me re çêdibû ji bo ku em nûçeyekê amade bikin. Ez wê înadê, îro zêde bi me re nabînim.

Bi dîtina te sebebê nebûna wê înadê çî ye?

● Esas ev meseleya tercîhê ye. Bersiva pirsê (kurd çima li Ewrûpayê nikarin rojnamegeriyê tetmînkir bikin?) cuda ye. Beriya vê pirsê divê bê zanîn ka saziyên medya yê kurdan ji rojnamevanên xwe çî hevî dikin, çî ji wan dixwazin. An jî xwendevanê li vê derê li benda çî ne. Ya rastî zêde projeyên saziyên kurdan nînin ji bo pêkanîna rojnamegeriyê hemdem. Ji ber vê yekê jî rojnamevan li vê derê zû bi zû nagihîjin. Hejmara rojnamevanên perwerdekirî û gihîştî pir hindik e. Hin îstisnê ne tê de, piraniya kesên li vê derê rojnamegeriyê dikin, rojnamegerî karê wan ê duyemîn e. Ji bo jiyana xwe berdewam bikin, pêwîst e li cihekî din bixebitin. Ji aliyê profesyonelîyê ve rojnamegeriya me ya li Ewrûpayê ji ya li Stenbolê û Enqerê li paştir e.

Kurdên ku li Ewrûpayê di beşa rojnamegeriyê de dixwînin, mîna rojnamevanekî îngilîz an jî alman dikevin nav kar. Kurdî an jî tirkî baş nizanin. Kurdistanê baş nas nakin. Di nav medyaya kurd de jî zêde bi ser nakevin. Rojnamevanên me yê ku ji Tirkiye û Kurdistanê tîr, nikarin bi jiyana Ewrûpa re entegre bibin; ji hestên penaberiyê nikarin xwe zû bi zû xelas bikin. Lê ev jî rast e: Bi rojnamevanên kurd re mereq jî tune. Ji ber vê yekê zêde naxwînin û li bûyeran nakolin.

Dûmahîk Rûpel 15

Binefsa Narîn û Cembeliyê Mîrê Hekarî -II-

Fariz Begê bi şev radibin malên xwe bar dikan, pez û berxên xwe berî nava hev du didin û dikevin serê riya bajarê Hekarî. Bila ew ji xwe re riya xwe bidomînin; em werin dora Dewrêş Begê:

Gava Dewrêş Beg serê sibê radibe, ji kerba Binefsê ne nan di qirikê de dihere û ne av pê de dihere. Rûdine bi nîfsîka ve li xwe dixê û radibe pêgermokê digerîne, çavên wî li riya qasidên Fariz Begê ne. Qelûna xwe dixê devê xwe û pê dixê, dûyê qelûnê li ser serê wî dibe mîna xelekkan. Roj tê nîvro, tu cewab ji qasidê Fariz Begê nayê. Dewrêş radibe xulamekî xwe siwar dike, berê wî dide mala Fariz Begê. Gava xulam tê ber deriyê mala Fariz Begê, bala xwe didê Fariz Begê çi, Binefsa çi, ne mal maye, ne xanî maye, li şûna xaniya newe newa pisikan e, kesek tê de tune ye. Xulam careke din ji paş ve dizivire, berê xwe dide mala Dewrêş Begê. Dewrêş Beg jî li ber deriyê malê rûniştîye, çavên wî li benda xulam e. Bala xwe didê xulamê wî ji wir de derket bi lez hespan dajo, li ser piştê hespan mîna teyreke hiltê û datê. Ji kerba, çavên Dewrêş rind naqêşirîne, dibêje: "Kuro ma ev xulamê min e ku wisa zû dajo tîn, li ser piştê hespan mîna teyrekî hiltê û datê." Xulam tîn li ber deriyê malê peya dibin, Dewrêş Beg baz dide pêşiya wan û dibêje: "Kuro xêr e?" Xulam dibêjin: "Axayê min bi Xwedê Fariz Beg ji êvar de rabûye mala xwe bar kiriye û çûye." Dewrêş Beg radibe pêncî siwarî bi xwe re hildide û dikeve pey şopa Fariz Begê. Bila ew şopa Fariz Begê bigerîne, em werin dora Fariz begê:

Fariz Beg pir tîn hindik tîn, zû tîn hêdî tîn xwe diavêjin bajarê Hekarîya, li Beriya Şikaka, di Tewrêzê de karvanên xwe didin seknandin, konên xwe vedigirin û jiyana xwe li wir berdewam dikin. Bila ew li wir bimînin, îcar em werin dora Kethan Paşa:

Kethan Paşa, di herêma derdorên Beriya Şikaka de dijî. Kar û şuxulên wî ji sibê heya êvarê seyr û nêçîrê dike û bi siwarî li pey xezala û li pey pezkoviya digere. Kethan Paşa gava sibê zû radibe here nêçîrê, berê tê li ser riya kaniyê disekine, gava qîz û bûk tîn ser kaniyê Kethan Beg jî tîr û kevanên xwe diavêje di qulpa cêrên destên qîza re derbas dike. Paşê jî dizivire ser wan dibêje: "We ji min mêtir, mêrxastir bedewtir kesek heye an jî na?" Qîz û bûk jî gazî dikinê, dibêjin: "Ji Kethan Paşa mêtir, mêrxastir, rintir kesek tune!" Di pey van gotinan re Kethan Paşa li hespê xwe siwar dibe û berê xwe dide nêçîrê.

Kethan Paşa rojek, dudu û sisê ber-

dewam dike, rojekê qîzek jê re dibêje: "Belê ji te mêrxastir, bedewtir û qonaxtir û navdartir heye." Kethan Paşa dibêje: "Kî ye ew mirov?" Qîzik jê re dibêje: "Ew Cembeliyê Mîrê Hekarîya ye." Kethan Paşa ji keçikê re dibêje: "Ezê herim Cembeli bibînim. Eger ew ji min mêrxastir, navdartir û bedewtir be; li dinyê tu çi bixwazî ezê bidim te. Eger tu qebûl bikî ezê te li xwe mar bikim, te bixim xanima mala xwe. Lê belê ku Cembeli ji min mêrxastir nebe, ezê serê te jê bikim." Qîzik jî qebûl dike.

Kethan Paşa radibe komeke siwar bi xwe re hildide, berê xwe dide mala Cembeliyê Mîrê Hekarî. Bila ew li wir bimînin, em werin dora Cembeli:

Cembeli jî tevdira xwe dibîne, ewê here herba Semertaşê. Temamî êla xwe li hev kom dike û ji wan re dibêje 'heya ez ji

merhebatiyê dide wan, dibe li diwanê dide rûniştandin, bi lez çeqilmastekê dide çekirin û ji wan re tîne û di dilê xwe de dibêje 'ev tev paşa û wezîr in, ka bise ez herim li aliyê herêmê ji xanimê re bêjim bila nan çêke, sifre bikîşe odê. Navê axayê min bi xerabî li nava xelkê derneyê, paşê di der heqê axayê min de tiştên ne rind neyê xebirdan, paşê axa ji min re nebêje 'min êla xwe teslîmê te kiribû, te çima wiha anî serê min?' Omê radibe diçe oda herêmê bala xwe didê, Xanima wî di hundirê odê de rûniştîye. Aşiq Omo gazî Xanimê dike û jê re dibêje:

Xanimê dilê min dibêyo

Xatûnê dilê min dibêyo

Li diwana mîrê

min peya bûne

ne

Tipek siwar bûne

mêvana

mîrê

min li

odêyo

Lê mirov li

ci-



herbê-vegerim axatiya êlê ewê bi destê Omo be. Eger hûn bi xebera Omo nekin, li hemberî Omo rabin, her wekî hûn li hemberî min radibin.

Lê gava ku ez ji herbê vegeriyam hatim, wî caxî xetayê Omo çi hebe em efû nakin." Êla wî jî qebûl dike, Cembeli êlê teslîmî Omo dike û xatîrê xwe dixwaze, leşkerên xwe dide pey xwe, berê xwe dide herba Semertaşê. Bila Cembeli riya xwe bidomîne, em werin dora aşiq Omo:

Aşiq Omo di dewsa Cembeli de bûye reyîsê êlê û li ser mînderê rûniştîye, emir li ser emrê dide. Rojekê Omo di diwanê de rûniştîye, bala xwe didê tipek siwar hatin li derê diwanê peya bûn. Xulam hespên wan dikişînin tewleyê, Omo dertê pêşiya wan, li bejn û bala wan mêze dike, bala xwe didê hemû mîna paşa û wezîra ne, cilên wan hemû bi mor û bi mezbete ne. Omo

lên wan mêze dike

mîna cilikên paşa û wezîrayo

De tu rabe non çêke bila sifre

bikîşe odêyo

Bila çay û qehwe çêbibe, li çay û

qehwêyo

Bila navê axayê min bi xerabî

derneyê li dinêyo

Piştî van gotinan îcar Xanim gazî Omo dike:

De lo lo Omo dilê min dibêyo,

Omo dilê min dibêyo

Ma qey tune ye mirtibên weka te

li dinêyo

Kî çi zane te mirtibên hevalên

xwe kom kirine ji kî derêyo

Anîne xistine diwana axêyo

Tu hatî ji min re dibêji:

Xanim rabe non çêke bila sifre

bikîşe odêyo

Mirtibê lawê mirtiba ha ji te re tasek

dewê meşê

Şeşek nanê sêlêyo

Tu bibe bavêje odêyo

Gava Xanim ji Omo re wisa dibê li zora Omo dihere, bi hêrs ji paş ve digere, dibêje: "De heyran ji min re navê axê, xerabî dertê, jina axa li navê axê nakeve, ez ê çima ber na axa bikevim, gor bavê axa kirî. Ezê herim di mala xwe de rûnim." Gava Omo ber bi mala xwe diçe bi rê de difikê dibêje "heyran axa mala xwe teslîm min kiribû, eger ez îro li êla axa nebixwedî, ev dibe bêşereftî, ma axê em êlê tev dabû destê min" Carek din Omo ji paş ve vedigere, nava êlê û gazî dike û ji wan re dibêje:

De gelî bira dilê min dibêyo

Sed carî dilê min dibêyo

Hûn rabin beran û berxan şerjê

bikin ji nava êlê

Bila qîz û bûkên êlê non çêkin hazîr

bikin sifre

Hatine mêvaniyên axayê min

paşa û wezîrê welatê xelkê

Bila navê axayê min xera nebe

li dinê

Bi gotina Omo re di nava êlê de ber qiyaketa beran û berxan, tîn şerjê rinê. Qîz û bûkên êlê zend û bend xwe hildidin jorê, dest bi çekirina nêçîrê dikin. Li aliyekî sifre dikîşe odê bîmêvana, li aliyekî çay û qehwe di ber mêvana. Heft roj û heft şev wan derbas dibe, êla Cembeli bi nêçîrê û bi şev ji Kethan Paşa re xizmetê dikin, roja ku hefteyek wan diçe Kethan Paşa ji Omo re dibêje "Mîrê min, ev heft roj û heft şev me ne, em li mala te ne, ka tu mîrê bîjî hûn kî ne, ji ku ve tîn û ku ve diçin?"

Omo jê re dibêje: "Paşayê min edetê me de heya heft rojên mêvana qedîn, em ji mêvana pîrs nakin ka hûn kî ne û ji ku ve diçin. Îro teze heftêyê we temam bû, emê îro teze pîrs bikin ka hûn kî ne û ji ku ve diçin."

Mêvan dibêje: "Ez Kethan Paşa mîrê belê ez hem mêrxas bûm û hem namdar bûm. Gava min tîr û kevanên xwe davêt di qulpê cêrên destên qîz û bûkan re derbas dikir, ji ber vê yekê min ji wan dipirsî û digot ji min mîrê tir kes heye an na? Rojekê qîzekê ji min re got ji te mêtir Cembeliyê Mîrê Hekarîya heye. Ji ber vê yekê ez jî hatim ku Cembeli bibînim. Lê belê ez hatim min tu dîtî, tu hem ji min mêtir î û jî bi qonaxtir î. Tu êdî îzna min bide, vegerim mala xwe."

BERHEVKAR: SERVET YÜKSEL



Li navêndên çandê çalakiyên ve hefteyê
Li NCM'ya Stenbolê
● **29.06.1997. Yekşem:** Konser Koma Çiya, saet:14.30
Yekitiya Malbatên Mezopotamyayê "Ji Xwarinên Kurdan Çend Mînak"
Sae:15.00
Dîlan Koma Serhildan Saet:18.00
● **02.07.1997 Çarşem:** Belgefîlmê İsmail Beşikçi, Derhêner: Ahmet
Soner Saet: 18.00
● **04.07.1997 Fr:** Bîranîn "Faik Bucak, di sala 1966'an de hate
qetilkirin." Sîyasetvan Tarık Ziya Ekinci û ji Weşanên Sosyal Enver
Aytekin. Saet:18.00
● **05.07.1997/ Şem:** Belgefîlmê Tevkujiyê, Saet:15.00

Sohbet: Serokê Komala Pîr Sultan Abdal a Enqerê Ali Balkuz, Hüseyn
karakaş: "Salvegera Tevkujiya Sêwasê" Saet: 16.30
Seriah: Tokat Almuslar Kültür ve Dayanışma Derneği, saet:18.00
Li NCM'ya İzmirê
● **05.07.1997 Şem:** Çalaki Saet:14.30
Konser Fevzi Kurtuluş Saet:18.30
Li Evrensel Kültür Merkezi
● **29.06.06.1997 Yekşem:** Belgefîlmê "Dîroka Tevgera Karkeran 1",
saet:18.00
● **30.06.1997 Duşem:** Belgefîlmê "Dîroka Tevgera
Karkeran(2)",saet:16.00

AWIR

Şehîdên Aştî û Azadiyê



HULUSİ KUL MEHMET KAYA MUSTAFA ÖZTÜRK

Ji bajarekî dîr hatibûn Enqereyê, bi dilekî ku tijî aşî û azadî ye ke-tin kongreya duyemîn a partiya xwe. Belê hay nebûn ku li vegeerê dij-minê zalim wê kemîneke xayîn li ber wan deyne. Dem ber êvarkî bû, belê wê kêliyê ji xwe re li stêrkan di-nêrtin an jî niqasha kongreya xwe ya duyemîn dikirin. Lê wê rojê diviyabû ku dawî li jiyana wan bihata û celandên xwinmij fermana ku hatibû dayîn, dê wê rojê bi cih bianîna. Rejîma ku ji ber provakasyona alê hemû rayedarên HADEP'ê girt û di dawiyê de jî bi salan ceza da rayedarên ve partiye, ji bo girtina kujerên wan sê mirovan tu tişt nekir. Ev helwest jî nişan dide ku ew kes ji hêla kîjan hêzan ve hatine kuştin.

Roja 22'yê pûşpera 1997'an li avahiya HADEP'a Bahçelievler Stenbolê ji bo şehîdên aşî û azadiyê, Hulusi Kul, Mustafa Öztürk û Mehmet Kaya, nêzîki 300 mirovî li hev civiyan û salvegera her sê şehîdan bi dayîna agahiyên li ser kurtejiyana wan û bi xwendina helbestan hatin bîranîn. Her wiha di bîranînê de serokê navçeya Bahçelievlerê Mahmut Özgür, xwişka Hulusi Kul Ayşe Kul,

Ahmet Cihan û Mahmut Can jî li ser hers ê şehîdan nêrinên xwe anîn ziman.

Hulusi Kul, Mustafa Öztürk û Mahmut Kaya sala 1996'an roja 23'yê pûşperê dema ku ji Kongreya Duyemîn a HADEP'ê vedigerîn ji aliyê kontrayan ve erebeyan wan li Sarıza ku navçeya Kayseriyê ye hatibû gulebarankirin. Di vê gulebarankirinê de Rêveberê HADEP'a Bahçelievlerê Hulusi Kul û du rêveberên HADEP'a Elbistanê Mustafa Öztürk û Mehmet Kaya can dabûn û hevalekî wan jî birîndar ketibû.

Xwişka Hulusi Kul, Ayşe Kul di der barê jiyana û şexsiyeta Hulusi de nêrinên xwe di bîranîna her sê şehîdên azadiyê de wiha anîn ziman: "Ew celandên ku xwîna Hulusî, Mustafa, Mehmet û hemû şehîdên aşî û azadiyê rijandin hêviya min ew e ku xwîna wan jî bê rijandin û jixwe tê rijandin jî. Hulusî û yên din, ji bo mafê gelê xwe, ji bo doza gelê xwe xebat dikirin. Belê piştî şhadeta Hulusî bi hezaran birayên min çebûn." Piştî vê axaftinê bi çepikên beşdarên dawî li bîranînê hat.

TÎŞK

ŞÜKRÜ GÜLMÜS



Henek û genek

Henek; tama jiyane ne. Jiyana bêhenek, mîna xwarina bêxwê û rijî ye. Lê, divê henek tu caran nebin genek. Wê wextê xwarin û jiyana li mirov dibe jahr û zikûm. Dilê mirovan dimîne, pevçûn û xerabûn tê holê. Ez dixwazim çend henekan bikim. Miraz û meqseda min hinek ji van henekan ev e ku ez tiştinên rast jî bînim zimên. Berê min wiha gotibû: "Hem bikene, hem bibîne". Belê, hem bikene, hem bibîne. Ku em karibin wê pêk bînin, ew bo me gelekî baş e.

Morgen!..

Morgen; bi zimanê almanî, sibe ye. Gava ku mirov, ji yekî re dibêje Morgan!...ê tê maneya "Beyanîbaş, rojbaş, sibeha tê bixêr..."

Koçerê, ji mêj ve hatibû Almaniyayê. Êdî zimanê almanî jî "hîn bûbû". Destê xwe dirêjî telefonê kir. Piştî ku telefonê lêxist, got:

- Morgen ciran!..

Cirana wê Perîxanê lê vegeand:

- Morgena te jî!..

Sosyalamt

Tiştên ku li Almanya, li pêşiya van 'sosyal' heye, hemû ji wextê "sosyalîzmê" ve mane. Sosyalamt jî yek ji van e. Maneya wê ev e ku mişkulatên civatî hal dike. Lê belê, di nava gelê kurd û hemû biyanan da; "mîrovên ku karê wan tune ye, mîrovên ku ji welatê xwe derketine, biyan bûne, mişkulatên vana çareser dike. Ê ku îltîca van qebûl bûye, heyvê 500 markên almanî distînin. Xanî didin wan. Zar û zêçên wan didin xwendin. Meaş didin zarokên wan. Ev tişt ji mîrovên ku bê armanc in re 'nîmeteke' gelek mezin e.

Şîrînê li Komela Karkeran axaftin dikir. Piştî ku axaftina xwe xelas kir; li civatê nihêrî û pirsî;

- Gelfî hevalan pirsên we hebin, bibêjin!.. Li gorî zanîna xwe em wan bibersivînin.

Zilamekî xurt, pazûben û li ser xwe destê xwe rakir.

- Heval ez dixwazim çend suala bikim.

- Belê, Fermo.

- An, tu dibêjî wê Kurdistan çêbibe?

- Li gorî baweriya mirov e. Ku tu bibêjî, dê çêbibe!.. Bawer bikî. Bixebitî. Tê bi koşî, wê çêbibe.

- Baş e.... Ku Kurdistan çêbû, dê Sosyalamt jî hebe?..

Wê çaxê Şîrîn hêrs bû.

- Kurdistan dê çêbibe. Ger tu baş zanibî. Lê ku ez sax bimînim, ji bo te, ezê çend salan sosyalamde qedexa bikim.

Siwarê Ronahiya Mûmê

Li wê odeya piçûk li hewşa fireh a bapîrê min, di wê şeva zivistanî ya baranî de, xewnên me mîna zaroktiya me ya bêcîr dikeliyan; nemaze dema ku birayê min, di wê civata ne-serbest de, şiyana û karinên xwe yê taybetî bi me didan bihîstin û amadebûna xwe bo xebitandina wan dianî zimên. Birayê min ne gelekî mezin bû, ew tenê bi du salan ji min mezintir bû. Ango, çardesalî bû, lê eger hat û karî (wekî ew dibêje) xewn û xwestekên me bi cih bîne, bêguman ewê tiştekî zor hêja û giranbiha be. Lê Kisra û Mistê, her du hevalên birayê min, hindêk awirên nebaweriyê digel düyê cigareyê berdidan. Girnîjîneke nîvgirtî û nîvkuştî, lê ne her gav veşartî, ji lêvên xwe nîşan didan.

Ez û Ehmed tim li nik hev, çavên me li lêvên birayê min bûn, ên ku niha rawestiyane li benda pîrseke ku bi şaşî yan bi dilpakî ji devê me derkeve û bi xwe re rêka berdewamkirinê ji bo wan veke. Min xweş dizanî ku du sal bes in ji bo min û Ehmed ta ku em karibin hêviyên xwe bi gotina wê ve girêdin. Di çavên zaroktiyê de, sihreke mezinahiyê heye ku dihêle zarok xewnên xwe li ser nepeniya wê daliqînin. Yan jî, ji bîr bikin.

Dawî bi xuşexuşa baranê û şîreşira şîronekê re dengê birayê min jî hat:

-Nekenin! Li ba min zehmetiya tu tiştî nîn e. Ez dikarim hemû xwestekên we pêk bînim. Ev gelekî hêsan e. Tu tiştê pê navê; tenê hindêk bixûr, mûmek, bêdengî û tu. Awirek pilingî li min veda û tilîka xwe wekî şûrekî tûj dirêjî min kir û daxiste kûrahiya sînga min û rêviyên min parçe-parçe kirin. Bi gotina 'tu' re kupekupa dilê min bilind bû, te digot belkî: Ez keroşkekê bextereş im, li nav penceyên lawirekî dirinde. Lê bi piçek şarezayî û bê ku ez diyar bikim ku sedem tîrsa min e, min xwe li paş xist. Û Ehmed jî, tek û tenê, bê pişt û penah ma.

Awirên me tevan li Ehmed werhatin û bi tîgihîstîneke derûnî ya plandar, em hemû gihan wê baweriyê ku Ehmed ji me hemûyan bêtir bi kêrî ve babetê tê..

Ehmed xwe da paş, lê wekî beytika ku ketibe dafe, her çiqas xwe bilebitîne ew qas lê teng dibe. Ehmed ji bêgavî çavên xwe yê şermîn daxistin ev nîşana qebûlkirina bîryara me ya bêveger bû. Hingê, birayê min rabû lempe vemirand û mûm vexist. Bêdengiyê em tev xistin bin baskê xwe. Tenê dengê birayê min diwarê tarî û bêdengiyê dihejand, wekî dilopên ku xwe berdidin testê, wesan dengê wî xwe berdida qehfên me û di nava mejiyê me de, tovîne dojhîn diçandin. Em dibirin cîhaneke tarî, nependî û sawdar

(heybet). Cîhaneke seranser rih û cin û hezret in.

Birayê min mûm danî ber Ehmed û ferman dayê ku li wî binêr, û hemû tiştên

rût û Marût.. bo xatirê Ra û Binyamîn.

Rûdanê Ehmed tarî dibû, xet û xalên rûyê wî li hev diketin, lêvên wî dilerin

Ez dê xezîne û gencîneyên Qarûn derînim. Xewn û hêviyên bav û bapîran pê bînim. Ev siwar bindestê min e. Hefsa-rê wî di destê min de ye û dengê min jî mîna qamçiyekî wî ber bi daxwazên min ve diajo.

Rawestî! Binêrin! Bibihîzin..!

Birayê min pê ve çû û got:

- Ehmed! Niha cîhê xezîneya zêr nîşanî me bide. Gelek xezîne û gencîne di zîkê gir de hene. Divê siwar wan nîşanî me bide.

Rûyê Ehmed dîsa tarî dibû, navçavê wî diqumişî, maskûleyên wî dişidiyan û dihatin rakişandin. Lê çara wî nebû, bêhêz û bêmedal ma li ber dengê kûr û bi heybet ku ji hemû aliyên tariyê ve dihat û ew ji desthilanîne dixist:

Divê tu bibînî, xweş nîşan bidî!

- Li ber dara sisiyan, li ber kevirekî spî yî mezin. Ez dikarim bibînim.

Dengê Ehmed bi bawerî hat û bi xwe re sînorên bêdengiyê û pêlên dengê birayê min şikandin. Girnîjînekerkeftî li ser lêvên wî diyar bû û hêdî hêdî vemirî.

Dema birayê min ev bersiv bihîst, li me nêrî û bi kenekî sivik got:

- We dît! Tu tişt nema. Tenê deranîn me.

Dîsan bêdengiyê konê xwe li ser me vegirt. Lê Ehmed zû bi zû ew hilanî dewma çavên xwe ji nişka ve vekirî. Ez nizanim gelo birayê min ferman dabûyê yan mêvanê xeyala wî ya dewlemend. Yan jî, wî bi xwe zanîbû ku rola wî gihîşt serî û êdî mana wî bi vî rengî bêwate ye û yekser got:

- Ez dê herim malê.

Birayê min jê re got:

- Bimîne ta em herin ser gir û..

Lê Ehmed li benda temambûna gotina wî nema. Derî vekir û derket bîyî ku ji me bixwaze, wekî her carê, em pê re bigihên ber mala wî.

Birayê min û her du hevalên xwe vegeriyan. Ew di bin herî û gemarê de mabûn. Bi germî, mişt û mir li ser he bûn û nebûna siwar û zêrê veşartî dikarin..

Heta vê rojê min eşkere ji birayê xwe nepirsiye; gelo Ehmed bo çî bi bêzarî ji nav me rabû û nema beşdarî civata me dibe.. Lê dema dengê birayê min û wêneyê wî gava ku awirên xwe li min berdidan û bi tilîka xwe ez nîşan dikirim, dema ev tev, tîn bîra min, ez baş tê digihêjim ku ji bo çî Ehmed xwe ji civata me diparêze.



dî-tir ji bîr bike. Dengê wî di tariyê de dihat; ji her çar kenaran, ji erdê, ji asmên; û ji ronahiya mûmê. Û di mejiyê Ehmed de hêlînek ji fer-

manên xwe re durist dikir:

- Here!

Banî şahê periyar bike. Bo xatirê Ha-

zîn û bi dijwarî bêhnaxwe dikişand û vedida, wekî ku kabûseke giran hatibe li ser sînga wî danîbe. Dengê birayê min mîna reşemarekî - Here! Bi-beze! Rabe! Bangî şahê periyar bike..

Ji nişka ve Ehmed raperiya, lê birayê min qayîm bi çepên wî girt û ew da rûniştin:

- Ranebe! Di dilê xwe de bangî şahê periyar bike. Çare nîn e hey ew dê bê!

Hinekî rûyê Ehmed vebû. Siwarê hespa boz hat û çareserîya wî bi xwe re anî. Ehmed li gorî gotinên birayê min ew da peyakirin û rûniştin. Şewqek ji çavên birayê min derket û girnîjînek li ser lêvên wî diyar bû, nîşana serkeftina wî bû.

Em mat û metel man, lê me hemû pirsên xwe daqurtandin. Birayê min, bo kurtedemekê, Ehmed rizgar kir û li me nêrî û got:

- Niha hûnê bibînin ez dê çî bikim.

İSLLAH EBDULFETTAH

Avaşîn dikemile

Kovara Înstîtuya Kurdî ya Stockholmê Avaşîn gihîşt hejmaraxwe ya 5'an. Di vê hejmaraxwe de mijara ku herî bi berfirehî li ser hatiye rawestîn, mijara yekîtiya kurdan û Kongreya Neteweyî ye.

M. Ali Tüysüz, li ser vê dosyayek amade kiriye. Tüysüz di vê, dosyayê de pêşî bîr û ramanên xwe yê li ser yekîtiyê, digel pêşnûmayeke Kongreya Neteweyî pêşkêş dike. Ew di vê nivîsa xwe de bi giranî li ser pêwistiya yekîtiya neteweyî û kambaxiya rewşa kurdan rawestiyaye.

Her çiqas nivîs hinekî rewşê ji rastiye kambaxtir nîşan dide jî, ji bo ku mirov bi ser xwe ve were, ew yek hinekî pêwist e. Lê ew nêzîktêdayîna ku her tiştî bi yekîtiyê ve girê dide û bêyî ku li ser niyeta hinek kes û rêxistinên raweste ji PKK'ê fedekariyê dixwaze, ne di cihekê xwe de ye.


Divê bê zanîn ku hinek rêxistin bi zanatî, ji sedî sed têkiliyên xwe bi rejîmê re qut nakin. Lewre ew jî dizanin ku ji bo rejîmê dijberiya bi PKK'ê re pîvana bingehîn e. Rejîm jî bo ku mafê jiyane bide yekî, mîna gava yekemîn jê dixwaze ku PKK'ê şermezar bike û wekî terorîst bi nav bike. Ev yek jî hêla hin kesan ve tê kirin. Divê mirov niyetan baş bizane, li gorî vê hin tiştan bibêje.

Nivîskar M. Ali Tüysüz piştî ku pêşnûmayekê ji bo Kongreya Neteweyî pêşkêş dike, li ser vê mijarê bi hin kesan re hevpeyvîn kiriye. Kesên ku pê re hevpeyvîn hatiye kirin: Mahmut Kılınc, Fı-

rat Cewerî û Vahap Serin in. Kılınc di hevpeyvîna de hinekî li ser niyeta ku me li jor qalê kir, radiweste.

Ji bilî vê nivîsê gelek nivîsên lêkolînî, çand û hunerî di vê hejmaraxwe de cih girtine. Bi taybetî hevpeyvîna ku bi kurdekî Xorasanê re hatiye kirin, li ser kurdên ku li vê deverê dijîn agahiyên gelekî balkêş dide.

Dîsa nivîsa Hesênê Alê ya bi navê "Em ji ku hatin", nivîseke hêja ye. Di



vê nivîsa lêkolînî de nivîskar li ser kurdên ku li Anatolê be-

lav bûne, radiweste. Ji bo ronîkirina mijarê, nivîskar hem

serî li çavkaniyên nivîskî, hem jî li kesên kal û pîr daye.

Serokê Înstîtuya Kurdî ya Stockholmê Mamosta Amed Tigrîs dide zanîn ku ewê ji vê hejmarê bi şûn de li ser "Pirs-girêkên kurdî" raweste. Di vê hejmarê de li ser rastnivîsandina navê neteweyan hatiye rawestîn.

Di hejmaraxwe ya 5'an a Avaşîn de nivîseke li ser "Bîwêjên kurdî" jî cih digire.

Ji bilî van nivîsan gelek helbest, nivîsên bîrewerî û çîrokên cihêreng jî di vê hejmaraxwe de hene.

Bo nimûne nivîsa bîrewerî ya ku ji rojnivîska Ayhan Kaya (Mordem) hatiye wergerandin, gelekî xweş e. Lê çîhef ku zimanê wergerê ne xweş e. Gelek çewtiyên rêzimanî pêk hatine.

Tevî nivîsên ku bi kurdî hatine nivîsandin, nivîsên ku ji zimanên din hatine wergerandin jî di vê hejmaraxwe de hene. Bo mînak nivîsa bi navê "Em parçeyek ji erdê ne" nivîseke bi vî rengî ye.

Li aliyê din tekane nivîsa gelêrî, strana bi navê "Sewdaliyê" ye ku ji devê Îsmailê Mergehî hatiye girtin.

Di vê hejmaraxwe de piraniya nivîsan bi kurmancî ne. Bi tenê encama komcivîna li ser zaravayê kirmanckî (zazakî) di nav rûpelên kovarê de wekî nivîseke ne kurmancî jî xwe re cih dîtiye.

Ev hejmaraxwe kovarê ji aliyê naverok û zimên ve ji hejmarên din baştir xuya dike. Lê dîsa jî hin çewtiyên tewang û çewtiyên cînavkan balê dikişînin ser xwe.

Navnîşan: Fridhemsgatan 15,3 tr.
112 40 Stockholm.
Tel/faks: 00 46 8 652 34 29

SERWISA ÇANDÊ

çivanok û pêkenok



Abbas İsmail

Çanda argoyî ya kurdan

Demek berê ji Lubnanê bi navê "Çivanok û pêkenok" pirtûkek ji me re hat birêkirin. Pirtûk jî aliyê Abbas İsmail ve hatiye amadekirin. Nivîskar di pêşgotina pirtûkê de dide xuyakirin ku wî bi handana (teşwikkirin) Prof. Dr. Celîlê Celîl dest bi berhevkarîyê kiriye. Berhevkar serpehatiyên herêma ku lê jiyaye berhev kirine. Di pirtûkê de bi giranî li ser jiyana du eşîran; Omerî û Bûbilaniyan tê rawestîn.

Pirtûk jî 100 zêdetir çivanok û pêkenokan pêk tê û 96 rûpel in. Her çiqas pirtûk jî aliyê çapê ve baş be jî, di warê rastnivîsê de kêmasiyên berbiçav tê de hene. Her wiha tiştê ku bala mirov dikişîne, pîrbûna çêr û dijûnan e ku hîç nehatine sansûrkirin. Ji bilî pêkenokên civakî, di pirtûkê de pêkenokên siyasî jî cih digirin.

Qelsiya saziyên me yên li dîasporayê

JAN DOST



Ev dinya bûye gundekî biçûk û bi saya informationisma nû tu dikarî dengê xwe bigihîni devera ku tu dixwazî. Ji we internet tiştê herî girîng û balkêş e di vê demê de. Alem nêzîkî hev dibe û bi qasî ku alem nêzîkî hev dibe, kurd dîrî hev diçin, rewşa ragihandinê û têkiliyên di ava saziyên kurdî de bêhêvîtiyê bi mirov re çêdike, gelo em ne di dema xwe de dijîn? Yan em li dêrveyî vî gundê biçûk in û tenê rola temaşevanan dilîzin? Gelo xelkê em ji bîr kirine, yan me xwe ji bîr kiriye?

Haya me ji hev nîn e, kitêbek li

Swêdê çap dibe, piştî çar-pênc salan çavê me pê dikeve, kovarek li Almaniyayê têweşandin, piştî deh hejmaran nû em dibînin. Ev guneheke mezin e û kelemeke bilind e, li pêş belavbûna ziman û çanda me.

Tu tişt me bi hev ve girê nade, ne komeleyeke nivîskarên wekî yên xelkê heye, ne jî yekîtiyeye rewşenbîran heye ku karibe rola xwe ya dîrokî bilîze. Ez dikarim bibêjim nav hene, lê bi rastî tenê nav in û bi cesareteke mezintir ez dibêjim: Ev nav, ji bo xemlê ne û ji bo ku xelk û milletên din bibejin: Maşallah!! Kurd jî xwedî sazî û komeleyên rewşenbîrî ne.

Bi rastî em nivîskarên kurd wekî porê (pirça) neşekirî ne, her mûyek bi aliyekî de çûye, ev bi xwe yek ji sebebên qelsiya nivîsên me ye. Nivîskarên navçeyekê her nivîsên hev û du dixwînin û her di yek sewiyeyê de dimînin.


Saziyên me yên hene jî bi taybetî

yên li dîasporayê, qels in û bê kêr in, di fikra wan de ku kurd li Îpsala û Bonn û Berlîn û Bruksel û Paris û Sydneyê tenê hene. Ev di xwe re nabînin weşanên xwe ji kurdên Kurdistanê re bişînin.

Dibe ku berpîrsên van saziyên qels bibêjin: Rewş kambax e û em newêrin tu tiştî ji tu kesî re bi rê bikin!!

Ez bersiva wan didim û dibêjim: Çima ew kesên eroînîroş, bi dehan kiloyên eroînê di heftê sînorî re derbas dikin!! û çima nivîskarên me yên bextreş berhemên xwe çep û rast bi rê dikin û çima hûn nikarin xwe bigihînin me?! Çima weşanxaneyeyeke wekî Nûdem, Roja Nû, yan Înstîtuya Parisê ne di bala wan de ye weşanên xwe (bê guman hêja ne) bi firehî belav bikin? Hîn wan, ji xwe re nekiriye proje ku şaxên xwe berfireh bikin û me jî (em nivîskarên li Kurdistanê) ji bîr nekin!!

Bînanileyh kezeb qulo



- 1 - Navê vê operasyona dawî çî ye?
 a) Çakûç
 b) Tevşo
 c) Kirbetan
 d) Moxil
 e) Dagirkirin
- 2 - Di vî şerî de şîara me wê çî be?
 a) Aysel tatile çix

- b) Terorin koki qazildî
 c) Asmayalim da besleyelim mi?
 d) Ya bitecek, ya bitecek
 e) Girdikleri gibi çıkarlar
 f) Girmex te zor, çikmax te!
- 3- Diyarî ji nîjadperestên tirkan re
 Ji Adriyatikê ta bi seda Çînê
 Dê xweziya we di qirika we de

- bimîne
 4- "Îroj her kes mîmarê dîwarê xwe ye"
 (E. Xanî)
 Kalo! Bi Xwedê hê jî hosteyê me
 (Mesud), sed mixabin mîmarê dîwarê
 cîranê xwe ye.
 5- Madem ku: "Dijminê dijminê min
 dostê min e"
 ez jî, "dijminê, dijminê dostê xwe
 me"
 6- Di navbera kûrdan û kurdan de heta
 niha çî taybetiya hevpar hebû.
 -- Kûrdan bikêrî paqijkirina diranên
 di nav sînorê ziman de tê
 -- Lê dostên Kurdan (!) jî wan ji bo
 sînorên dewletên xwe (ji dijminan)
 paqij bikin bi kar dianîn.
 7- Dinya li ser qiloçê gamasî ye, an
 li ser edeleta esasî ye
 8- Şaşiya pêşiya!
 Pêşiyên me li paşiya me mane.
 Em, paşiyên, pêşiyên xwe ne
 Û pêşiyên paşiyên xwe.

Bînanileyh kezebqulo!
 Fevqeleda "doh doh bû, îro îro"
 Hey hişgenî, dev şerbeşîro,
 Faşîstê gewre ji ter bêm çilo..!

Tansu

Xanim Tansu, kepir zerê,
 Derew neman weka berê,
 Wer ji navm 'A taxîmî' derê
 "An bitecex an tuyê herê!

Erbaqan

Birêz Erbaqan, îbn-î derew,
 "Biratiya îslam" tew gidî tew,
 Bes van omînan têxe xew,
 Hey Hîzb-î qontra bi teve de hew!

Ecewît

Bey Ecewît, qaraoxlan,
 Xwediyê kevoka ji kaxezan,
 Dê Îsa bide wê rih û can
 Şowenîstê sosyal ji faşîstan

Çend pesiname Silo

Hey lo Silo, mey lo Silo

MIHEMEDŞA XWENAS

BIXELAT...

XAÇEPIRSA BIXELAT (74)

XAÇEPIRSA

Polayê anwardî Kese di wê de	H	S	E	M	D	Î	N	S	A	K	I	K
Rûkê (bi navê) feromîn çavîn	S	E	herî ye	S	Aras dera ber	O	Mulh Dayik	A	V	A		
Çîbe rasane Sembola fêrê	N	I	V	Î	N	Arasê	A	R	D	Liçekêk berreşahi	I	D
Hejmarêk	T	N	A	R	Î	N	Bi sorani	N	Î	N		
Bajar "Ewrala" sername	S	A	R	S	P	Î						
	T	Î	R	E	T	A	R					

Bersiva Xaçepirsa 72'yan

Xaçepirsa me bixelat e.
 Di 15 rojan de çî bersiv
 bigihîjin me, emê wan
 binirxînin û bi rîya pişkê li 5
 kesan belav bikin. Xelata
 hejmara me ya 74'an
 Încîla Yûhana'ye
Jêrenot:
 Ji bo ku bersiva we bê
 nirxandin, divê hûn
 "Peyva Veşarî" di nava
 qutiyên li bin xaçepirsê de
 binivîsin û tevî navîşana
 xwe ji me re bişînin.



Pênc kesên ku xelata xaçepirsa me ya hejmar 72'yan pirtûka
 Celalettin Yöyler (Gelperwerî û Nijadperestî qezenc kirine.
**Hakan İmer/Meletî, Yusuf Dündar/ Wan, Cemil Bilgiç/
 Edürne, Şevket Ates/ Amed, Şükrü Güneş/ Bursa**

Zengîni Derhênerê Veng û vaz	Xwedayeke Yewnanî Cinavkek	Baş Stiyasî	Dînî Navekî mêran	Gihanekek	Bi ktrdkî gtrse, cemawer
Wisa	9	3		Mektup	
Sembola gelan	Kesê serbest	Cinavkeke işarkî	Endam	Bi devkî nayê	
Cinavkeke işarkî Bi sorani ev	Anî Tîpa dawîn	Metod Cezayê herî gran	Astrolojî Nav û deng	Astroloji	5
2		6	Gep, dêm Ji herêma toran		
Neteweyek			Wêneguhêz		
Qertafeke tewangê	Namûs	Feraqeke pivanê Ajanseke tirkan			
Sêberg		7	Pêşgîrek		
Jê mast çêdibe					
1	Kesê berpirs				

PEYVA VEŞARÎ → 1 2 3 4 5 6 7 8 9



Destpêk Rûpel 8-9

Kêmasiyên mîtbexa medyaya kurd çî ne?

● Esas ev kêmasî her wiha pirsgrêkên me yên bingehîn in. Em pera bi makîneyan didin, li kompîtur û avahiyên pera xerc dikin, li mirovan xerc nakin, em ji bo perwerdehiya mirovan zêde serê xwe naêşînin û pera jî ranazînin ji bo giandina mirovan. Em çareserkirina pirsgrêkên rojnamevan û edildandina wî di ser guhê xwe re diavêjin. Li Ewrûpa bêhtir rojnamegeriya li ser maseyê, an jî rojnamegeriya faks û telefonan tê meşandin. Divê em ji vê yekê xelas bibin.

Di pênc şeş salên dawî de nêzîkî du hezar rojnamevan di rojnameyên me de gihîştine û her yek ji wan bi cihêkî ve çûye. Piştî rojnamevanên me bi çar aliyan ve bipelîşin, wê çawa ev pirsgrêk çareser bibe?

● Ya rastî di salên dawî de belavbûn, li cem kurdan bû wekî qedere, bû kevneşopek. Yanê em her tim terkese dibin, direvin, cihê xwe diguhêzin. Wê rojê li Almaniyayê ez rastî kurdekî hatim. Digot ez dixwazim herim Amerîkayê. Ev bîst sal e ku li Munîhê dijî û ji nişka ve, pê girtiye ilehî dê here Amerîkayê, ew jî nizane çima diçe. Hesteke wisa bi rojnamevanên kurd jî girt. Çi bû ji wan nizanîm, her tim direvin, ew jî baş nizanîm çima. Erê, zor û çewsandînen dewleta tirk hene, lê belê ez bawer nakim ku serê ew tenê be. Xwesteka rewa bê sebeb jî sebebê girîng e. Bi bawerîya min rola saziyên me yên medyayê jî di vê de heye, yanê wan di karibû bi awayekî rê li ber vê belavbûnê bigir.

Bêbersiyariya rojnamevan jî di vê de tune?

● Esas ev pirsgrêk ne tenê ya rojnamevanan e, em wekî civak di nav rev û belavbûnekê de ne. Niha bi giştî atmosfereke wisa serdest e di nav kurdan de. Ne tenê rojnamevan, parêzer,

mamoste, siyasetvan, gundî, xwendevan û hwd. piraniya kurdan bi hêsaniyê dev ji kar û barê xwe, dev ji cih û warê xwe berdidin û diçin, ew jî nizanînin diçin ku û bi ku ve direvin. Ez dikarim bibêjim ku niha ev belavbûn an jî rev yek ji bingehîn pirsgrêka Şoreşa Kurdistanê ye jî.

Ji çapemeniya nivîskî derbasbûna nav a dîtbarî bi xwe re çî problem peyde kirin?

● Esas hemû terrûbeyên me, çî yê baş çî jî yên nebaş yekser derbasî televîzyonê bûn. Çewtî û kêmasiyên me yê berê yekderb di televîzyonê de jî xwe dane xuyakirin. Televîzyon navgîneke dîtbarî ye, bi xwezahî gelek xisûsiyetên wê yên ji rojnameyan cuda hene. Tevî vê yekê kesên di warê rojnamegeriya nivîskî de serketî, dikare di televîzyonê de jî rojnamegeriyeke baş bike.

Tu rewşa MED-TV çawa dinirxîni?

● Metodeke ku kurd pir jê hez dikin heye, û mixabin vê metodê gelek zerar daye me: Metoda fêrbûna bi riya ceribandîne. MED-TV jî li ser wê metodê meşiya û giha heta îro. Helbet di nav demê de em fêrî gelek tiştan bûn, lê bi buhayekî giran. Yanê me jî tecrûbeyên xwe yên rojnamegeriya nivîskî zêde sûd wernegirt, ji ber hezkirina metoda fêrbûna bi riya ceribandîne. Tevî vê yekê MED-TV wekî neynikeke civaka kurd e, ne tenê tecrûbeyên rojnamegeriya nivîskî, her wiha pêwîst bû hemû zanînen komkirî yên civaka kurd di televîzyonê de xwe bidana xuyakirin. Hûn dizanin ji bo ekraneke bi qelîte, sînema pêwîst e, şano pêwîst e, muzîkaleke bi qelîte pêwîst e. Xisûseke girîng a ku divê ji bo MED-TV bê gotin ev e: Raqîbê MED-TV ne yek an jî didu ne; gelek raqîbên wê hene. Bi awayekî MED-TV divê bi hemûyan re bikeve nav pêşbaziyê. Ji ber ku temaşevanên MED-TV li cografayêke pir fireh, li zêdetirî

35 welatan belavbûyî ne. Îro Tirkiye, ji bo ku temaşevanên me ji MED-TV dûr bixe, vê navgîne heta dawî bi kar tîne.

Bi bernameya Ronahî te dixwest çî bikî? Tiştên te danîbûn ber xwe, te çi qas pêk anî?

● Di destpêkê de me dixwest em bernameyeke ku diplomasiya kurdan ji xwe re bike mijar çêbikin. Me digot emê tiştên li derdora Kurdistanê rû didin, di Ronahiyê de bidin xuyakirin. Me dixwest em berê objektîfên xwe bidin ser Rojhilata Navîn, Îran, Qafqas û tiştên ku li wan deran diqewimin, bi giranî jî tiştên ku bêhtir kurdan eleqedar dikin û wan di ekranên MED-TV de pêşkêşî temaşevanên MED-TV bikin. Ji van tiştên ku me danîbûn ber xwe me piraniya van pêk anî. Tevî vê yekê hin pirsgrêkên ku di MED TV de hene, Ronahî jî ji wan bêpar nema, mesela me ekîbeke bi dilê xwe hê jî çenekirîye.

Di nav şertên şer de te li Bakurê Kurdistanê rojnamegerî kir. Rojnamevaniya di şertên şer de dijwarî û xweşiya wê çî ye?

● Beriya ku di nav têkoşîna germ a Kurdistanê de rojnamevaniyê bikim, min pirtûkên hin rojnamevanên şer xwendin. Yek ji wan mesela Oriana Falançî, an jî Hemîngway û hwd. Vê rojnamegeriyê ecêb ez ber bi xwe ve kişandim. Wan bi min re heyraniya şer afirand. Lê belê piştî ku tu şer nas dikî, tu dibînî ku şer her wiha awayê herî dijwar ê hilweşandinê ye. Em her wiha terefek in di nav vî şerî de. Ji ber vê yekê rojnamevaniya me ya objektîf jî di asteke nizm de dimeşe. Lê belê di şer de, di giyana rojnamevan de jî depremên mezin çêdibin. Mesela hin kesên ku min di jiyana sivil de nas dikirin, di nav şer de careke din dîtin. Ew pir zû mezin dibin û dipijin.

HEVPEYVÎN: MAZHAR GÛNBAT

Ferhengok

gotar: maqale
hemdem: nûjen, modern
hûmêrîn: dahûrîn, analîz
kambax: xerab, berbad
karesat: trajedî, felaket
kemilîn: geşbûn, stewîn, perisîn
kujer: mêrkuj
mişxîf: derketî, sirgûnî
navgîn: amûr, hacet
nepenî: veşarî, nehênî, dizkî

nimîner: nûner
pêşdarazî: pêşînhişkûm (önyargî)
pêwendî: têkilî, danûstandin
pêşnûma: proje (taslak)
pîvan: krîter (ölçüt)
raqîbî: rabûrî, mazî
refgirtin: safgirtin, alîgirtin
rêpîvandî: meşiyar, rêveçûn
rojnivîsk: rojîn (günce)
tegezdar: tevgav, zivêr, aciz
tika: rica
weje: edebiyat
xudbînî: ezperest (bencil)

betek: reaksiyon
berebazî: pêşbazî, mîlmilane
bêcîr: cimexweş, şûm
bîwêj: îdiyom (deyim)
bîrewerî: bîranîn, xatira
cîhêreng: xweser (özgün)
çavdêrî: izlenim, gözlem
çêr: çêr, sixêf, xeber
dirinde: hov, weşş
dîtbarî: dîmenî (görsel)
edildandî: serastkirin, têkûzkirin
eger: peywir, wezîfe
gelemperî: giştî, tevayî

Kevirên Koçanîsa birîndar li ber xwe didin

Berî zayîne pêncsed salî Qeşê Nastûriyûs ku di eslê xwe de xwecihiyê Pazarcixa Maraşê ye. Dema Konstantînopolisê (Stenbolê) de qeşetî dikir, hin dîtinên nû û balkêş avêtin holê. Got ku: "Îsa kurê Meryemê ye û di binyatê xwe de ji nesla Dawid e. Sedemê mezinatiya wî benîtiya Xwedê ye." Konsûl a Efes ê di 431'ê de ev dîtina wî qedexe kirin û ew sirgûn kirin beriya Lîbyayê.

Ez li wê deverê mezin bûm û niha jî li wir dijîm. Ji ber wê çendê nivîskarên herêmê gelek bala min dikişînin. Beriya çend rojan min pirtûka xwişka 'Surme Xanim' ya bi navê "Adetên Dêra Rojhilata Asûr û Qetilkirina Patrik Mar Şênûn" dubare kir. Nivîskar a dilkovan bi berhema xwe ya nemir berê min zivirande têkiliyên kurd û asûriyan yên dema berê.

Navê gelê Asûrî 2000 sala beriya îsal hat bihistin. Di bingeha xwe de samî bûn û ji aliyê başûr ve ketin Mezopotamyayê. Devera rûbarê Zê têkilî Dicle dibe damezirîn. Ji rêzê ve Asur (Kat'an şer-gat), Kalah (Numrûd) û Nînova (Musil) jî xwe re kirin serbajar. Sargonê duymîn li bakurê Nînovayê, bajarê navdar Dûr-Şarrûkîn dan ava kirin. Lê ji ber mirina wî ya zû, vî bajarî paytextî nekir.

Xaka Mezopotamya û ya deşt û pêgeh, Kîfîkya, Sûriye û Mîsir dût û dirêj di bin destê wan de mane. Bes konfederasyona Naîrî û Urartûyên çiyayî serê xwe li ber wan tu caran neçemandin. Qralên asûriyan hem gelek xwîn rijandin û talanên cîranên xwe rakirin, hem jî ji aliyê medeniyetê ve gelek berhemên bi nîrx ji mirovatiyê re kirin diyarî. Împaratoriya gewre 612 salan beriya zayîne ji aliyê Mediyên cîranên wan ve di şanogeha dîrokê de hate faşîl kirin (qedandin).

Ji ber êrişên împaratoriyan nû roj bo rojê kêmedan. Roj hat di deştên Mezopotamyayê de sazgeh nebûn û xwe vekîsandin çiyayên Kardûkî û Mediyên. Ew

çiyayên çend sedsalan berê dibûnearmanca tîrên wan, roj hat ew ji êrişan parastin û ji wan ra mertalî kirin. Surme Xanim jî dibêje: "Ji bo demekê diçûn wan deveran, lê ji kevnariya dêran xuya ye ku dût û dirêj ew li wan deran jiyane."

Berî zayîne pêncsed salî Qeşê Nastûriyûs ku di eslê xwe de xwecihiyê Pazarcixa Maraşê ye. Dema di Konstantînopolisê (Stenbolê) de qeşetî



dikir, hin dîtinên nû û balkêş avêtin holê. Got ku: "Îsa kurê Meryemê ye û di binyatê xwe de ji nesla Dawid e. Sedemê mezinatiya wî benîtiya Xwedê ye." Konsûl a Efes ê di 431'an de ev dîtina wî qedexe kirin û ew sirgûn kirin beriya Lîbyayê.

Piştî mirina wî û mirîdên wî ew dîtin

li nav asûriyan çiyayî dane belavkirin. Li gorî Surme Xanimê dêra navendî berê li Bexdayê, paşê li Mûsil bûye. Ew di serê qîrînê 17'an de wê jî tînin Koçanîs.

Li gorî agahdariyên salnameya Wanê ya 1881'ê hejmara Nastûrî yên devera Hekarya 120 hezar bûne. Ev hejmar beriya şerê cîhanê yê yekemîn li dora 200 hezarî bûye.

Her wekî tê zanîn Mîrê Hekariyê Nûrûllah Beg di sala 1847'an de beşdarî serhildana Bedirxan Begê bûbû. Di faşîlbûnê de mîratiya herêma Hekariyan jî ji holê rabû. Piştî wê bûyerê di herêmê de valatiyêke siyasî peyda bû. Êrişên kurdan yên deverê mezinahiya hev û din nepejirandin. Giraniya dijminên kedxwar roj bi roj, zêde bû. Dagirkeran mijarên olî xistin pêşiya yên neteweyî

belengaz de ev diruşme derketibû ber pêşberî wan. Kurd ji aliyê faris, ereb û tirkî ve û gelê asûrî jî cih bi cih ji aliyê împeryalistên ûris, fransîz û îngilîz ve hatin xapandin. Neyarên her du gelan jî nexweşî û alozî xistin nava wan. Cihê biratî û cîraniya qîrnan, dijminahiya girt. Beriya serhildanê Bedirxan Beg du caran hat ser asûriyan herêma Hekariyê, di 1843'yan de Tiyar, di sala 1845'an de jî Koçanîs Dêrz Kambax û wêran kir. Wê êrişê birîneke kûr xiste laşê gelê asûrî ew der barê kurdan de bêbawer kirin.

Cenga cîhanê ew herêm gişk da valakirin. Asûrî hin çûn Kurdistana Başûr û hin jî çûne Rojhilat. Neyarê rojên koçberiyê jî dest ji wan bernedan û serhildan tifaqa her du gelan de davikên xiyane lê vedan û raçandin. Di sala 1918'an de Mar Şemûn Binyamê Koneşehîr a Îranê bi destê wan axayê Şikarê Sîrko bi xiyaneftî dan kuştin. Her du aliyên tevkuştî bi pêş ve birin. Kurdan pêşî mala asûriyan, piştê jî mala xwe bi destê xwe xerab kir. Hin derfetên dîrokî û 80 salên piştê jî bi wî awayî berzebûn.

Di salên 1940'î de gundê Koçanîs ke-te destê qebîleya me. Em payizê diçûne serdeştê Koçanîs. Xanima min Besê, jî di 1947'an de li Koçanîsê hate dinyayê. Salên paşê jî dema em diçûne zozana Berçelan, ez salê carekê diçûm li Koçanîsa pîroz digeriya. Bihara her wekî bûkekê bi nêrgîz, beybûn, alal û asmîna xemilandî bû.

Sala 1995'an dagirkeran dîsa manasîr dane valakirin û agir berdanê. Ew derlaliyên ji ber bager û bahoza megingehên pêşiya vemayî jî hatin bêqemkirin. Ji 1915'an vir de ji bilî gelek êriş û talanan ev cara sêyemîn e ku ji mirovan tê valakirin. Îro kulekên Dêrê yên bi ronahî tarîfî girtine û bûne hêlîna şevrevka, ban û sîvanên wê qulibîne. Lê berxwedana kevîrên wê yên birîndar guleyan hê dom dike.

û herêmi. Diruşmeyên nû ji welatparêzan re biyan bûn. "Ev cenga cîhada misilmanan e. Kesên ku kafîran neyîne ser rîya rast, ew xiyaneftî bi baweriya Mehmed dikin û ji olî derketî tînen hesibandin.", "Ji bo misilmanan yekîti, qehir bibin hemû kafîr."

Di serhildanên gelê kurd ên bîndest û

Î.CULEMÊR

Ûlkede

GÜNDEM

Günlük Gazete

wê rojeva we
bê guhartin

Di nêzik de li bayîyan e

